

Herdis Palsdottir

Mindal û hevbendî

Nûser: Herdis Palsdottir
Nawî kitêb: Relasjoner med barn
Copyright 2010 © Herdis Palsdottir
Oversatt til kurdisk: Ako Modiri
Nîgarkêş: Bjørg Thorhallsdottir
Omslagsdesign: Hama Saatchi

Mindal û hevbendî
Tercemey le norwêjyewe: Ako Mudîrî
Dîzaynî berg: Heme Seatçî
Torî fêrkarîy biradost www.bradost.net
Oslo 2017

Weşanxane û nûser moletyan dawê be tercemekirdinî em kitêbe bo zimanî kurdî, em terceme kurdîye bo bazar û firoştin nîye.

Forfatter har gitt tillatelse for oversettelse av boken relasjoner med barn til kurdisk, men ikke for kommersiell bruk.

Jeg vil takke min kjære venn ako modiri for at han nå gjør boken tilgjengelig for den kurdisk talende befolkning. Han har min fulle støtte i sitt arbeid, med å dele tanker som han anser som verdifulle, med sitt folk.

Herdis Palsdottir

Forfatter av boken relasjoner med barn

Demewêt supasî hawrêy hêjam Ako Mudîrî bikem bo sazandinî em kitêbe bo xelkanî kurdîziman. Ako tewawî piştîwanîy minî heye le geyandinî em bîrokaney xoy pêywaye sûdbexşin be gelekey.

Herdis Palsdottir

Nûserî kitêbî "Mindal û Hevbendî"

Em berheme be elfbêy aramî:

https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/Mindall_u_Hevbendi.pdf

Pêrist

Pêşgutar.....	4
Mindal mirovî hestekîn.....	7
Paşxan.....	12
Şêwazî corawcorî reftar legel mindal	15
Ger detewêt gorankarî bikeyt, lexotewe destpêbike.....	22
Bawan yekemîn mamostay fêrkarî mindalin.....	28
Mindal pêwîstî be bawanî helebeder û nimûneyî nîye	31
Mindalî emro bawanî sbeynêye	43
Dûwagute	47

Pêşgutar

Pêşgutarî derûnsarêj¹ Jesper Juul

Nûserî kitêbî pirfiroş *“Your competent child”* (*“Mindale karameket”*).

Hawbehayî, zimanî kesekî û fêrbûnî dûlayene destewajey bineretîn lem kitêbe nayabe ke derbarey danûstan û bûne letek mindal. Wesfî em destewajane her wek danûstanî- pejrênerê,² ne şêwaze ne rêbaz, belam corîke le bûn û le rastîda babetêk nîye derbarey perwerdey mindal. Belam biniyadinerî hevbenîyekî³ nêzik û berhembexş le nêwan mindal û bawan – le mawey jiyanda – tenha bo îsta û bo çarey kêşe nîye. Sereray nebûnî rênimayî derbarey perwerdey reftarguncandin bepê wîstî bawan û serpereşt lem kitêbeda, be hezareha bawan û pêdagogîş le sî salî rabirdûda kokin le ser ewey reftarî rûxêner yan xorûxênî mindal û genc tenha katêk dekirêt bigordirêt ke bawan berpirsayetîy reftarî xoy bigirête esto û reftarî xoy bigorêt.

Derikî civak derbarey perwerdey mindal lem bîst saley dûwayîda hênd asan û seretayî kirawetewe mirov îdî basî civakandin⁴ û perwerde nakat, belkû basî mercekanî dekat. Şêwazekanî perwerdekirdin karîgeyî saxtarekî zor keme, sereray ewe bawan em layene debînêt, belam kardanewey berdeyam wek pêşûwe. Rastyekî aşkiraye radeyekî kem lew koşeyê eme le buwarî perwerde deykeyn karîgerî û nexşî sazandey le ser mindal heye. Perwerdey girîng xoy le nêwan hêlekan debînêtewe (Hêlî danûstanî gewre û mindal), dekirêt wek tekdanewe⁵ y reftar û şêwazî bûnî bawan bêt û lêreda derbirîn û axawtinî zarekî bawan rolî here girîng degêrêt.

Mindal pêwîstî be bawanî helebeder û nimûneyî nîye, ewan pêwîstyan be bawanî berpirsiyare ke bîr û kirdarî hawsozekî bêt lebirî şêwazekî. Em kitêbe bem hemû nimûne rengîne rênimayekî başe bo bawanêk bûwêrêt yarîy be pênasay xoy bikat yan bo serpereştêk letek mindal û genc yan kar dekat yan dejît.

Jesper Juul

¹ Derûnsarêj: therapist kesêke piley pîşeyî le derûnnas newîtire û birîn yan kêşey derûnî sarêj dekat.

Derûnsarêjî: therapy sarêjkirdinî birîn yan kêşey derûnî lay derûnsarêj.

² Pejrandin: selimandin, qbulkirdin bo layenî derûnî.

³ Hevbenî: relation nêzikayetî nêwan mirovekan û pêkewe bendbûnyan yan bestiraweyîyan, wek bawiketî, dayiketî, xuşketî, dostayetî, xizmayetî, hevaletî, hawkaretî û ...htd.

⁴ Civakandin: komelayetîkirdin, mindal fêrî reftarêk bikeyt le civakda pesend bêt yan letek normekanî civakda rêk bêt.

⁵ Tekdanewe: reflex, al-in`ikas. Kitêbî *“zarawesazî pêwane”*, mamosta Mesûd Mhemed.

Pêşgutarî derûnsarêj Herdis Palsdottir

“Ême civakî xoman pêkdênîn û civakîş pêkhênerî êmeye”.

Ew civakey ême buniyadî binêyn, danerî mercî bineretîye bo pênasay rast û çewt. Bo nimûne reftarî jin debêt çon bêt, piyaw debêt çon bêt û çonetî reftarî letek mindal û helsengandinî.

Bekurtî peyamî em kitêbe birîtye le reftarî to letek mindalda, şêwazereftarêk ke be rêjeyekî beriz geşe be xohestî⁶ mindal bidat. Mindal heta temenî şeş salî bûnewerêkî tewaw hestekîn. Ewan lem nasikesalyey temenda fêrdebin hestekanî xoyan yan be hend werbigirin yaxud perawêzî bixen. Fêrbûnî herkam lem layenane wabesteye be rêjey behendûwergirtinî hestî bawan xoy û hestî mindaleke. Ger êmey bawan twanay behend wergirtinî hestekanî xoman û hî mindal bîn, mindalîş fêr debin hem hestekanî xoyan behend werdegirin hem hî ême. Binewanî hestzîrek⁷ y le şeş salî berayî temen geşe destênêt, beray min eme dakewt⁸ êke civakî ême heta îsta piştgiwêy xistwe.

Ême civakêkiman pêkhênawe ke mindal wek mirovêkî biçûk û natewaw debînêt ke berdewam xerîkî sinûrbezênî, çewtîrewî û rêzî bawan yan serpereşt⁹ negirtine. Arezûy min le nûsînî em kitêbe badanewey em rewteye ke êmey serpereşt mindal biselimênîn, mindal ewey ledestî bêt be baştirîn şêwey xoy deykat û ewan reftar û kirdarî bawan kopî deken - betaybet bawanî xoyan.

Em şêwaze reftarey newe le dûway newe letek mindalda way kirdûwe zorêk le mirov hest be nakamî û lawazîy xomtimane bikat. Dîsanewe em mirovane nimûnen bo mindalî emro, encamekey debête neweyekî xomtimane lawaztir û xodîd¹⁰ -î nizimtir ta radey rûxan.

Bo gorînî em rewte nayetîye pêwîste êmey bawan hoşiyarî reftar û gutarman bîn, betaybet katêk letek mindaldayn, berpirsayetîy xoman binasîn. Pêwîste ême xorêziman hebêt û xoman behend bigirîn û pêşan bideyn ke rêz lexoman degirîn. Em core xodîde sexte bo zorbey bawan, hokarekey degerêtewe bo ezimûnî mindalî. Bêguman xo behendgirtin wek serpereşt asan nîye, ger tak le dewranî mindalîda behend negîrabêt.

Xwêner lem nûsîned a derbarey bîrokey şêwazî reftar letek mindal, hawbehayî¹¹ gewre û mindal û berawerd nekirdiniyan fêr debêt. Şêwaze reftarêk ke yarmetîdere bo xo behend wergirtin, heta mindal bizanêt letek kêdaye. Em şêwaze hestî asayîş be mindal dedat katêk letek serpereştêkdaye berûnî xoy aşkiray dekat ew kêye û çî dewêt: Serpereştêk ke berûnî pêwîstî û sinûrî xoy derdebirêt bêwey bikewête demeqale û serkoney mindal. Be bîstinî wîst û xwastî to mindal ne hestî birîndar debêt ne pêydeşkêt. Ger mindal hest be şikan letek toda bikat, hokarî hî ewe nîye to çît gutûwe, hî ewey çon wîstî xotit derbirîwe.

⁶ Xohest: xonasîn le buwarî hestekîyewe, nasînî hestekanî xudî tak. Kesêk hestî xo binasît hestî beranberîş reçaw degirêt, hestzîrek wajey niwêy yan serdemî xoheste!

⁷ Hestzîrek: emotional intelligence twanay nasînewey hemû hestekanî xot, behend wergirtinyan û rêzgirtin le hestî beranber.

⁸ Dakewt: emir waq`. Birwane “zarawesazî pêwane”, Mesûd Mhemed.

⁹ Bawan yan serpereşt: watay em dû wajeye lem pertûkeda le şiwênî bawik yan dayik berêjey yekem, mamosta, rahêner û herkesêk ke berpirsayetîy mindalî le estoye le mawey jiyana da hatûwe.

¹⁰ Xodîd: twanay hestkirdin be pêwîstî, sinûr û rêzdan bo xudî xot.

¹¹ Hawbehayî û berawerd nekirdin: hawsengî nêwan gewre û mindal, seng danan bo mindal bê ewey berawerdî bikat legel xot.

Mindal sereron, belam tekdaneweyan nîye le sereroÿî xoyan - fêlbazîş nîn - ewan her wehan! Boye pêwîstyan be serpereştêke be dilovanî rêniwênîyan bikat heta xomtimane, şadî, berhemhênî û kunçikawyan¹² biparêzirêt.

Min pêmwaye erikî perwerdekirdinî mindal le hemû erikêk quristire. Belam ger to em erike wek proseÿ fêrbûn bibînît ke têyda derfetî taqîkirdinewe û helekirdin be xot bideyt bêewey xot serkone bikeÿt, ewkat derfet be mindal dedeyt reftarî serpereştêk kopî bikat û rêge be xoy dedat mirovêk bê berdewam le geşeda bê. To ewey ledestit dê deykeyt, to le geşedayt.

Min hîway serkewtinit bo dexwazim lem proseÿ fêrbûneda!

Herdîs Palsdutîr

Supas

Min mindalî dewranî xomim û herwek zorbey xelkî dîkem kirdûwe, reftarî minîş letek mindal herwek reftarî bawanim bû letek minda. Katêkî zorî wîst heta twanîm reftarî xom bigorim bo em şêwazey lêreda wesfî dekem.

Îsta min hevbendyekî zor başim bedest hênawe letek hemû mindalekanimda. Mebestim eweye hokarekey degerêtewe bo em rêbaz û bîrey lem kitêbeda deyxeme berçawî xwêner. Min dezanim serçawey nêzîkî û hevbendîy resen le nêwan xêzan û dostda gencîney bêbinî asûdeyî û şadîye, şadîyekî bêsinûr ke şayanî hemû mirovêke.

Lêreda dexwazim supasî hemû mindal û bawanêk bikem ke le rêgeÿ kar û jiyanî kesekîmewe hevbendîm legelî bûwe, betaybetî mêrdî azîzim, sê kiçe nazdarekem û mêrdekaniyan û kiçeza zîrekekanim bo hemû şitêk. Min le rêgeÿ hevbendî legel îwewe xomim nasîwe.

Supasêkî taybetî bo kiçegewrem û hawkarim Dora Turhalsdutîr. Supas bo hemû gftugoy hejêner û handerit û herweha hawkarît le nûsînî em kitêbe. Min û Dora le *EQ – Institutt* wane delêynewe. Hêndêk le babetî wanekan lem pertûkeda basî lêwe dekirêt.

¹² Kunçikaw: kesêke berdewam seriqalî dozînewey kun û qujbinî şitêk yan babetêk bê, birwane “*Ferhengî Xal*”.

Mindal mirovî hestekîn

Mindal heta temenî hewt salî mirovêkî hestekîye.¹³ Lem temene nasikeda hestekan cêgîr debîn, bo nimûne hestî xobeha¹⁴ yan nebûnî. Mindalêk hest bikat rêz le hestî nagîrdirêt û le layen bawanîyewe perawêz dexirêt, her heman rewî fêr debêt û hestekanî xoy perawêz dextat. Ew fêr debêt ke hestekanî zor girîng nîn, be xoy delêt min zor girîng nîm, min bêbehame.

Min pêmwaye kem kes heye yek yan çend beserhatêkî sarêjinekirawî le dewranî mindalîda nebêt. Hêndêk car xemî dewranî mindalî hênde mezine ke beşêkî zor le jiyânî dewranî gewreyî dagîr dekat. Ewkat em take dû bijarey heye: Yan xemekey be hemû encamekanîyewe bişarêtewe, yan bîselimênêt û destî lê helnegirêt û karî legel bikat heta wîrdewirde le xoy dûr dexatewe.

Min çendîn sal karim legel xemî mindalîy xomda kird, be wergirtinî derûnsarêjî¹⁵ lay derûnsarêj, derûnnas û xwêndinî derûnsarêjîy xêzan twanîm zorêk hokar û şewazî sarêjkirdinî xem û xemî kon bedest bînim û çareserîşî bikem. Hokarî xemî min perwerdey hebûnî bawanêkî hejimûnî¹⁶ û bêperwa bû. Handerî serekî min le nûsînî em kitêbe tîşxistine ser layenekanî jiyânî mindalîye heta mindalî emro beşî zorî jiyânî dewranî riskawî xoy terxan nekat bo sarêjkirdinî xemî mindalî, tenha leber nezânî bawanêk ke le şewazî perwerdey kon baştirî nezânîwe.

Min pêmwaye dewranî mindalî piştgiwêxirawe, hoy nebûnî zaniyarî pêwîst û bêagayî derbarey zeremendbûnî mindal leber behend wernegirtin, xoşewîstî pênedan û hîsab bo nekirdinî. Katêk mindal debînet hestekanî lelayen bawanîyewe nadîde degîrdirêt û perawêz dexirêt, xodîdî bem arasteye geşe dekat. Fêr debêt hîsab bo xoy nekat û hestekanî perawêz dextat.

Mindal le 6 salî yekemda rêjey berzî hestzîrekî bedest dênêt. Lem temene girîngeda mindal yan fêr debêt hestî xoy behend werbigirêt yan perawêzî bixat, ewca rêz bo hestî kes dananêt. Min pêmwaye sexte mirov bitwanêt hevbendyekî baş bisazênêt ger be rêjeyekî baş peywend nebêt legel hestekanî xoyda, yan hestzîrek (EQ) nebêt.

Hestzîrekî çîye?

Kitêbî *“Emotional intelligence”* (*“hestzîrekî”*) zorcar be binewanî EQ nawzed dekirêt. Nûserî emkitêbe Danîyel Goliman profîsorî derûnasye le zankoy Harvard. Goliman le kitêbekeyda îşare be pênasay Peter Salovey le zankoy Yaley Danmark dekat ke hestzîrekî be pênc twanay serekî dariştûwe:

1. Nasînî hestî xot.
2. Kontirrolî hestekan.
3. Dinedanî hestî xot.
4. Nasînewey hestî xot lay kesanî dîke.
5. Hunerî nêzîkbûnewe le kesanî dîke.

Paş 17 sal le pîşey derûnsarêjîy bepêwîstî dezanim twanayekî dîkeş bixeme ser em pênc twanayey peywest be çemikî twanakanî hestzîrekîyewe EQ, bemşeweye,

- Twanay pênasay hestî wirujênerî xot
- Twanay parastinî hestî beşeweyekî baş

¹³ Hestekî: emotional betewawî bestirawe be hestewe, wabeste be hest.

¹⁴ Xobeha: self-worth behay mirovî, hest be behay xokirdin.

¹⁵ Derûnsarêjî: therapy sarêjkirdinî birîn û beserhatî hestşkên û derûnhejên le mawey jiyânî rabirdûda.

¹⁶ Hejimûnî: hegemony zal, takrew, deselat, zalbûnî bawan beser mindalda, hemû şitêk le rêgey tirsandin û hereşewe serçawe degirêt.

- Twanay xodinedan yan xohandan
- Twanay nasînewey hest le kesani dîkeda
- Twanay biniyadnanî hevbendî nêzîk, rastgo, pir le mîhrebani û ptew legel kesani dîke

Katêk mindal ledayik debêt xoy lê namoye, ew xawenî em pênc heste bineretîyeye, “şadî, xem, tûreyî, tirs û hez”, belam natwanêt lêkiyan ciya bikatewe û nawî hîçîşiyani nazanêt. Boye pêwîstî be bawanêke hem hestekani xoy hem ew hestey lay mindal deybînêt be wişe derîbibirêt: Bawanêk mindal be ziman wişebaran deken, pêwîste hawkat hemû hestêkî xoyan û ewîş destînîşan biken, heta ewîş wîrdewirde şeş twanay peywend be hestzîrekî binasêtewe.

Yekêk le amojgarîye benawbangekani Sokrat peywendî be behay hestzîrekîyewe heye, delêt: “Xot binase!”.

Pêwîstîyekî bineretî le jiyanda bo zorîney xelk buniyadnanî hevbendyekî nêzîk, rastgo, pir le mîhrebani û ptew legel xotdaye (Xonasîn), heta twanay biniyadnanî heman hevbendî legel ew kesaney arezût heye le jiyantda bunyan hebêt bisazînît. Bo biniyadnanî em core hevbendye legel xot û kesani dîke, pêwîste şareza bît le wajebendî hestzîrekî û bekarhênanî.

Xemî dewrani mindalî

Ezimûnî xom legel bawikim, bawikêkî zor hejimûnî û tundûtîj, qsey ew yasa bû, derfetî gftugokirdin qet nebû. Ew leber şitêkî zor sade ture debû, bo nimûne ger min şîrim ledest berbûwayetewe be ser rûpoşî mêzî xwardinda ew destî dekird be lêdan be ser mêzekeda û gutinî qsey naşîrîn û bêrêzîkirdin. Be mindalî zor le bawikim detirsam û be mirovêkî pert û heleşem dezanî.

Ezimûnim le dayikim, dayikêkî zor bêperwa bû bensbet kesayetî û çonetî halî minewe. Qet nayete bîrim tenha bo carêkîş çêrokêkî bom xwêndbêtewe yan goraniyekî bom gutbêt, tenanet lebîrim nayet carêk leser koşî danîştêbêtim, yan beşewazêk qsem legel bikat ke bîhewêt legel bîr û hestekanim aşina bibêt.

Encamî em şewazey dewrani mindalye bûwe hoy dirustbûnî hestêkî zor behêzî tenhayî le minda û salanêkî zorî pêwegilam. Min hestim dekird le cîhanda betewawî tenham, ne kesêk hebû bimselimênêt û ne xulyay nasîn û halî minî hebêt û bizanêt çon deşîm. Pêmwaye wesfî em heste behêzey tenhayî û derbirîni be wişe zor girane û ew wişaney bekaryan dênim ew heste tenhayîye bêbine le bêkesî napêkêt ke salanêkî zor jiyani lê tal kirdibûm. Em hestî tenhayîye bibû be awazî binemayî le naxmda û hemû wize û şadyekî lê betal dekirdimewe. Em betalkirdinewey wizeş bibûwe hoy bêoqreyîm bêwey xom agam lê bêt. Seriqalîm be îşêkewe bo min zor girîng bû, pêçewanekey debûwe hoy serheldani hestî tenhayî, ew hestey nemdewîst hîç derbarey bizanim û bêaga xom lêy dedizyewe.

Jiyani hawsergîrîm le temenî 22 salîda pêkhêna ke zor zû bû le çaw civakim. Xoşbextane mêrdkem hemîşe xoşewîstî bêmercî dedamê û berûnî pêdegutim ke şanzîm pêwe dekat, nek leber karameyîm yan raperandinî erik, belam leber kesayetîm wek mirov. Hawkat min hemîşe hevalim hebûn, em hestî tenhayîye leber bêhevalî û wergirtinî xoşewîstî bêmerc le temenî serpereştîda nebû. Nexêr, hestî xo betenha zanî, yan hestî bêbehayî lewêwe serî helnededa ke kes nebêt îste min bipejrênêt, em hestane le temenêkî zûtirda çekerey kird û çespa bû, deyan salî jiyanim bekar hêna heta twanîm em bare lekol xom dabigirim.

Xwêner dekirêt pirsyar bikat: “To ke em hemû xelket le dewr bû, bo biryarit nededa ke hestî tenhayî le xot dûr bixeytewe?” Pêt delêm ger bem hasaniye bûwaye be şadîyewe dûrim dexistewe, belam lojîk derwestî dûrxistinewey nedehat. Bepêçewanewe min pêwîst bû çendîn car rûberûy twêkile corawcorekani em heste birîndarane bibimewe heta wîrdewirde twanîm lekolfî bikemewe. Belam boçî

min em heste behêzey “Kes minî xoş nawêt”, “Kes min napejrênêt”, hestî tenhayî, yan “Hestî bêbehayî” em le naxda çespî bû?

Katêk mindalêk xoy be behadar dezanêt, leber eweye serpereşt yan bawanî behay bo dadenêt. Ewkat mindal hest be behayî xoy dekat û fêr debêt xoy bibînêt. Mindalêk hest be bûnî xoy bikat, yan fêr bêt hestekanî xoy be hend werbigirêt (Leber eweye bawanî wa dekat), em mindale begewreyî hest betenhayî nakat.

Bo ewey mindal hest be xobehayî bikat pêwîstî be serpereştêke girîngî pêbdar û bîpejrênêt. Kewabû serpereştêk boy girîng bêt mindal binasêt, debêt hemû reftarêkî mindal behend werbigirêt.

Katêk ezimûnî mindalî xom beser dekemewe, lelayenî maddîyewe hîç kemukuryekim nebû. Belam buwarî naxekî bawanim baş nebû, ewan birînî mindalî xoyan sarêj nekirdibû û hestekanî xoyan nedepjrand, her boyeş twanay selimandinî miniyen nebû. Mirovêk twanay xoderikî nebêt, natwanêt kesanî dîke derik bikat. Yan be corêkî dîke: Rêjey peywendît legel kesanî dîke, peyweste be rêjey peywendît legel xotda.

Bawanî min le jiyânî xoyanda zor layenî jiyaniyan be hend wernedegirt. Eme way dekird ewan ew hestane bişarinewe ke neyandewîst şitêk derbarey bizanin. Beşeweyekî dîke bilêm ewan be rêjeyekî kem peywendyan legel xoyan hebû, leber ewe hestekanî xoyan nedepjrand. Encamekey debûwe xêzanêk, bawan twanay xodîdî nebû, her boyeş neydetwanî mindal behend werbigirêt yan bîpejrênêt.

Bedaxewe, pêmwaye zorbey bawan agadarî ewe nîn mindal debêt hestekanî behend werbigîrdirêt û biselimêndirêt. Zorbey bawan birînî sarêjinekirawî heye (Wek çon min bo xom hambû), emeş debête hoy nedîtinî pêwîstî naxekî mindal, be heman rêje pêçewane debû ger ewan twanay pejrandinî xoyan hebûwaye.

Min biryarim da daway lêburdin bikem le her sê kiçekem, leber zor qse û reftar û kirdar beranberyan, katêk ewan mindal bûn. Nek leber ewe min xoşyanim nedewîst, belkû leber nezaniyê baştir û leber nebûnî peywendyekî baştir legel xomda û xo nenasînim.

Mirov begîştî pêwîstiyekî bineretî heye be hestî xobehayî. Be bûnî hestî xobehayî û jiyân le cîhanda, yan, wek min ke pêçewanekey bûm, biryarder debêt le çonetî xodîd û çonetî reftar legel kesanî dîkeda. “Katêk min hestim be nebûnî xobehayî dekird”, “Ke min şayanî xoşwîstin nîm”. Em bîre way lêdekirdim netwanim stayiş yan newazşêkî dostane le kesêkî dîkewe biselimênim, yan bawer be beranber bikem. Sîstemî wergirtinî min lem buwareda wek tîfilun¹⁷ wa bû. Be hîç şeweyek birwam be qsey wa nebû!

Em bîre hokarî be astemkirdinî xoşwîstinî min bû le layen mêrdekemewe. Min hemîşe pêwîstim be derbirînî xoşwîstî ew bû, belam be tewawîş birwam pêy nebû!

Hestkirdin be nebûnî xobeha akamî firelayanî debêt bo kesî griftar. Layenêkî temawî em gîrodeyîye bo dewrûber, pêwîstî kesî griftare be hestî xobeha, her boye bêaga berdewam bedûway stayiş, xoşewîstî û pejrandinî, bêewey twanay sûd wergirtinî lêy hebêt. Katêk kesî griftar twanay pêdanî xoşewîstî bexoy nebû û neytwanî xoşewîstîş le kesî dîkewe werbigirêt, çemikî xoşewîstî le la betal debêtewe û ew xoşewîstiyey deydar be kesanî dîke mercbend debêt. Bêguman hestî xobeha û tenhayî le takda wabesteye be rêjey behêzî û lawazî em hestanewe herweha peywendî be twanay xodîd yan pêdanewey xoşewîstî be beranber.

Bawanim ewey ledestyan hat bo min kirdyan, belam twanay pêdanî pêwîstîye here bineretyekey min - hestî asayîşî derûnî û mtimandedan be min nebûn ke min hest be xobeha bikem û ciwanîyekanî xom bibînim.

¹⁷ Tîfilun: teflon tîfilon maddeyeke ke hîç şitêk bexowe nagirêt, le dirustkirdinî mencelda bekar dêt.

Min le bawanî xom burdûm û ewan be mirovî baş dezanim, min ewanim xoş dewêt û dezanim ewanîş miniyar xoş dewêt, herçend min le mindalîda ew hestem nebû. Pêmwaye det direng nabêt bo bedesthênanî dewranî mindalyekî baş, îsta ke min birînî xemî mindalîm sarêj kirdûwe û bawanî xom azad kirdûwe twanay bînînî hemû çakeyekiyanim heye.

Lêburdinî bawanim bom zor girîng bû, hem bo azadkirdinî ez¹⁸ y xom û hem bo pakjirdinewey hestî xemî dewranî mindalîm, heta bitwanim be şeweyekî hawsoz û rastgoyî berfirewan legel mindal û bawan rûberû bibimewe.

Mindal be dilovanî û karameyî civakîyewe ledayik debin

Salanêk pêş îsta le dezgey amojgar¹⁹ y pêdagogî û derûnnasî (*Pedagogisk & psykologisk rådgivningstjenste*) le Norwêj karim dekir, (lew katewe ta îsta zor şit lem buwareda gordirawe). Eriki ewkatey min lem dezgeye serdanî zaroxane, pêdanî amojgarî û “Çakkirdinewey” mindalî griftdar û reftaraloz bû. Dekirêt bilêm ew mindalaney bepê arezû û daxwazî serpereşt reftaryan nedekird.

Rojêkiyan le şiwênî karekem kitêbêkiyan damê ke karîgerî zor Leser danam. Nawî kitêbeke “*Your competent child*” (“*Mindale karameket*”) lelayen derûnsarêj Jesper Juul nûsirawe.

Jesper Juul le kitêbekeda amaje be ledayikbûnî mindal be karameyî civakîyewe dekat û denûsêt, ger mindal reftarî legel civakda neguncêt, leber eweye ew behend negîrawe. Mindal wîstî hawkaryan heye legel bawanî xoyan. Katêk ewan hawkar nîn, leber hoy piştgiwêxistinî pêwîstî û sinûrî mindalekeye lelayen bawanewe. Yespêr delêt berpirsayetîy hevberdîy nêwan mindal û serpereşt le estoy serpereştdaye.

Em boçûne hemû lojîkî fêrkarî û perwerdeyî heta ewkat min fêrî bibûm serûbin kird. Heta ew rojey em kitêbem xwêndewe dilniya bûm ke mindal pêwîstî be fêrbûnî twanay civakîye û mindalî reftar aloz debêt fêrî reçawkirdin û rêz girtin le mindal û gewre bibêt.

Lew katewe min zor seriqaî fêrbûnî em babete bûm, her boye wazim le karî rawêjkarî hêna û destimkird be xwêndin le Enistîtwî Kampl le welatî Danmark, Yespêr mawey 25 sal berêweberî em şiwêne bû.

Paş çend sal xwêndin le buwarî derûnsarêjî û tewawkirdinî le welatî Danmark komelêk zanistî niwê fêrbûm û le buwarî karda ezimûnim kird. Ezimûnî derûnsarêjîm û sazdanî zor semînar derbarey em babete (Yarmetîdanî beşdarbûwan bo sarêjkirdinî birînî kon û sarêj nekiraw) legel Doray kiçim, betewawî pêş selimandim çende mindal berşikan²⁰ e û birînî dewranî mindalî sarêjinekiraw, çende karîgerîy mezinî debêt Leser corayetî hevberdî le jiyânî serpereştîda. Her boye bîrî hevberdî debête peyamî serekî lem pertûkeda.

Îste birwam waye hemû mindalêk be dilovanî le dayik debêt. Mindalêkî saxlem paş zanêkî siruştî dûway 25 xulek le zanî dest dekat be peywendî girtin le rêgey lasayîkirdinewey û kopîkirdinî serpereşt û her berdewamîş debin.

Bo nimûne, ger mindalêk leber berkewtinî şiwênêkî lekatî culan dest begiryan dekat, kardaneweyekî siruştîye le hestkirdin be azar. Ger serpereşt legel mindalekeda bêt, biçête astî mindal, hestî hawsozî pêşan bidat û bilêt: “Oy, ewe azarî hebû”, wa dekat mindal hest be xodîd û rêzlêgirtin bikat. Mindaleke le serpereştewe fêrê em core kardanewe debêt katêk kesêk azarî pêdegat û degirî. Ger serpereşt be pêçewanewe bilêt: “Wis be, bêdeng be, ewendeş azarî nîye, dey!” Yan “Dey başe, hîç

¹⁸ Ez: ego, xud, layenî jîrîy, bîrîy yan eqlanî tak, ew layeney mirov derik be xoy dekat, xoy debînêt û heldesengênît.

¹⁹ Amojgar: erikî amojgarîkirdinî xelke.

²⁰ Berşkan: şitêk bête şikandin. Pêşgirî “ber” bewatay “qabil II-” -î arebî dêt, kitêbî “*zarawesazî pêwane*”-y mamosta Mesûd Mhemed.

nîye çak debêtewe! Xo to leber eme namirît”, mindaleke emeyan fêr debêt, hem katêk rûberûy xoy debêtewe û hem hî kesanî dîke, dekatewe şêwazêkî bêhawsozî û bêselimandin. Dijwestan katêk derdekewêt, mindal rêk lasayî serpereşt dekatewe, ewkat her heman kes delêt “Em mindale hestî hawsozî zor keme”.

Îsta detwanîn bilêyn bijarey yekem pêşanderî rêbazêke derîdexat êmey mirov bêkemukurî nîn û hemû kesêk dekirêt le arastey bijarey dûhemda birîndar bikirêt. Serşarî baseke helbijardinî em yan ew şêwaze reftare nîye legel mindal dekirêt, belkû sizadanî mindale leber kopîkirdin yan fêrbûnî reftarî ew gewraneyê le jîngeyandan. Min emeyan zor benarewa dezanim.

Qeyranî mezin bo mindal, hebûnî bawanêke ke berdeyam be şêwazî neselimêner legelî bidûwên: “Wis be, bêdeng be. Emendeş azarî nîye!” Yan: “Dey başe, hîç nîye, çak debêtewe, xo to namirît”. Ew kat mindal berdeyam hest be şikandin û nebûnî xobeha dekat. Em şêwaze birînî qûl le derûnî mindal deriwênêt. Mindal lêreda fêr debêt ke “Hestekanî ew girîng nîn”.

Em mindale hestbirîndare dû derfetî lepêşdaye bo parastinî xoy. Yan tûre û tundûtîj derdeçêt û berengar debêtewe. Yan bêdengî hel debijêrît û le derûnî xoy rodeçêt. Ew têdegat hîç yarmetî yan xoşewîstyekî dest nakewêt. Lêreda mindal fêr kirawe: “Her bimşkêninewe, min rahatûm be şikandinewe”. Herdû layen sextange²¹ bo mindaleke. Ew wirdewirde xobeha yan ezî rasteqîney ledest dedat û jiyay boy bêwata debêt.

Min îsta têdegem boçî em riwangeyey hevbendî legel mindal hênde karîgerî le ser min hebû. Wek pêştirîş basim kird ne pejrêndiram û ne be şêwazêkî baş reftarim legel kira. Her boye bijarey bêdengîm helbijard û le derûnî xom roçûm, ewkat hîç kesêk nebû le halim b.

Boye delêm mindal “Twanay civakî heye” ewan dilovanin katêk dêne em cîhanewe. Zorbey bawan pêwîste bexoda biçinewe û reftar û kirdaryan legel mindal hawseng biken, hokarekey degerêtewe bo hebûnî bawanêk ke nimûne û serçaweyekî baş nebûn bo ême. Werin ba em lêşawî nayetîye bûwestênîn!

²¹ Sextang: qeyran, pêçewaney “geşend û tejend”, birwane “zarawesazî pêwane”.

Paşxan

Le mawey em 30 ta 40 salî rabirdûwe goranêkî zor be ser civakî êmeda hatûwe. Bo minî temen 60 sale watakey debête ew civakey bawanim miniyay boy perwerde kird îsta bûnî nîye û nemawe. Bo tîşk xistine ser em layene destewajey civakî heremî²² û civakî torbend bekar dênim.

Civakî heremî

Mebest le civakî heremî civakî pîşesazîye, le civakî herimî tak pêwîste cêgey xoy le civakêkî negorda destînîşan bikat.

Lebîrme katêk mindal bûm bawanim em çawerwanîyaneyan lemin hebû:

- Bedesthênanî birwanameyekî here baş,
- Peydakirdinî kar,
- Hawsergîrî,
- Dirustkirdinî mindal,
- Katêk bûme xawen mindal wek jin dû bijarem le berdestda bû, yekem le malewebimênimewe xerîkî perwerdey mindalekanim bim, dûhem biçime naw bazarî karewe.

Le civakî heremîda çawerwan dekira kirêkar wefadar bêt. Bo nimûne “Pîneçyetî, legel tewawî temenda debû”. Gorînî pîşe le mawey jiyânî karîda ne arezûy kes bû ne ayetî²³ debînira. Wergirtinî pîşe wek nerît le newey konewe bo newey niwê zor baw bû, kurî qesab debû be qesab, kurî masîgir debû be masîgir.

Em şêwaze seqamgîr û negore nîşaney civakî heremîye rengdanewey le jiyânî kesekîşda hebû. Be şêwazêkî dîke bilêm: Ger xêzandar bwît, îdî xêzandarît. Carêkiyan giwêm le dîmaneyek bû le nêwan jinêkî betemen û kiçe hewalinêrêkî genc, jine betemeneke basî 63 sal jiyânî hawjînî xoy û mêrdekey kird, lepir hewalinêreke bem pirsiyare qsekey pêbirî: “Qet bîrit le ciyabûnewe kirdûwe le mawey em şêst saleda?”. Jinî temendar hêndêk rama pêş ewey welamî bideatewe: “Ewkat wabû, katêk jiyânî hawsergîrîman pêkhêna, dergey derbazbûniman best”.

Dekirêt bilêyn piştgîrî û seqamgîrîy nîşaney serekî ew dewrane bû.

Xêzanî ême be dahatî bawikim dejiyayn her boye ew serokî heremî xêzanî ême bû. Lebîrme dayikim be êmey her çiwar mindalî xêzanekey degut: “Ba bawikitan bêtewe, pêdelêm qsetan legel bikat, min em şêwaze reftarem nawêt”. Cêgey bawik le xêzanî ewkatda be rûnî destînîşan kirabû. Bo nimûne pal be lankey mindalewe nan û daybî gorîn îşî piyawî asayî nebû. Yan wek kiçêkî 7 salan gutî: “Le rabirdûda bawik hîç karî beser mindalewe nebû. Ew ne deyzanî mindal le kiwên ne le kiwêwe hatûn”. Lebîrme zorcar serpereşt biyanwîstaye ême le qsanîyan tenegeyn, le nêwan xoyanda be zimanî îngilîzî dedûwan. Carêkiyan min em basem le kobonewey bawanda wek nimûney kemireçawgirtinî mindal le layen bawanewe xiste berbas. dayikî mindalêk be şêwazêkî xorexne²⁴ û galteamêz²⁵ beserhatêkî xoy bas kird: “Min û mêrdekem legel mindalekan rêkkewtîn derbarey bekarhênanî zimanî îngilîzî ke herkat bem zimane qseman kird basî kirîn û dabeşînî diyarekanî serî sal dekeyn. Boye wa debû le mangî dîsember kotay sal zor be zimanî îngilîzî dedûwayn. Rojêk le kotayî mangî beharda le nêw otombîl min û hawserekem le pêş û kure pênc salanekem legel hevalêkî le paş êmewe danîştûn, ême bezimanî îngilîzî basî babetêkiman dekird leber ewe mindalekan tenegeyn. Giwêm lêbû hevalî

²² Heremî: sêgoşey herem, leserewe bo xwarewe.

²³ Ayetî: erênî, positive.

²⁴ Xorexne: rexne lexo girtin.

²⁵ Galteamêz: be galtewe basî babetêkkirdin.

kurekeman pirsî, bo bawanit bem core dedûwên?: Kurekem le welamda gutî, wa diyare katyan lê têkiçûwe, wa dezanin serîsale! Nazanin hawîn berêweye”.

Mebestî min eweye bawan detwanin basî taybetî xoyan helgirin bo katêk mindal le dewrûberyan nîn.

Civakî torbend

Mebestim le civakî torbend, civakî emroye. Tak le civakî torbendda rûberûy goranî xêra debêtewe, lêre seqamgîr wekû westaw yan çeçbestû hsabî bo dekirêt. Takêk civakî bêt, xomtimaney hebêt û berhevî²⁶ bêt le civakî torbendda rêzlêgîrawe.

Le civakî heremîda saxtarî deselatî welat û buwarî civakî kesekî reqe. Tak pabendî nerîtî giştye, “Îdî waye!”. Civakî îsta le yekrewt û yekişêwazewe geşey kirdûwe bo behay firecorî firerewt û firehelwest. Emro derfetî tak pitire bo buniyadnanî jiyani kesekî û dariştinî saxtarî xêzan bew şêweye tak arezûy lêye. Nimûneyekî zor baş bawanî kiçe çkoley hevalêkime. Bawikî em kiçe xelkî birîtaniyaye û le welatî xoy dejît û dayikî xelkî îtalyaye û le îtalya dejît. Bawanî em kiçe mawey 23 sale hawserin û her yekeşyan hemîşe le welatî xoy jiyawe.

Dekirêt bedilniyayîyewe bilêm, îsta tak bo xoy biryardere le pênasay pêkhate û çêwey rêkxistinî jiyani kesekî xoy.

Le civakî torbenda fêrbûn be dirêjayî temene û zor kes sereray pîşedarî sinûrî babetekan têdeperênin û le babetî niwê xoyan teyar deken. Le fêrge meylî xwêndin leser babet û projey corawcor le sinûrî baziney pol û baziney temen têper debêt. Le zaroxaneş beheman şêwe mindal le beşî ciyawaz nawinawe pêkewen û legel babet û projey corawcor hawkarin.

Serenc girtin lem layene girînge, mindal le her torêkda dine bidirêt û çalak bêt, ew tore lelayen serpereştewe pênasay û destinişan kirawe.

Katêk mindal berdewam le torî corawcorda rûberûy mindalî dîke debêtewe, rojane berokgîrî xorêkxistin debêtewe legel çendîn mindal û serpereştay. Em şêwaze ciyawazî zore legel dewranî mindalî minda. Ewkat min pêş destpêkî fêrge beşêweyekî giştî tenha dayikim û ta radeyekîş bawikim legelim bûn xom legelyan rêkbixem. Lew maweyey le fêrge bûm begiştî tenha yek mamostam bû ke wanebêjî hemû pilekanî fêrgey bineretî leesto bû.

Mindalî emro le torî corawcor le zaroxane, fêrge û senterî çalakî paş fêrge beşdare. Zor layenî dîkeş hen wek torî kesekî, bo nimûne torî min, to û mindalekaniman.

Çûnî mindal bo senterî çalakî dûway zaroxaneş şitêkî bawe. Carêkiyan bawikêk pêy witim: “Min natwanim bê silawî hewalpirsî belay em hemû şofêr taksyeda têperim ke hemû dûwaynîweroyek min û mindalekanim lem senterî çalakîye û bo yekêkî dîke degiwêzinewe. Hest dekem em nêzîkiye wek hawkarî lêkirdwîn!”.

Mindalî emro rojane legel hejimarêkî zor serpereştada reftar dekar, em hokare pêwîstyek derexsênêt bo pitir peyvrûnî²⁷ êmey serpereşt, bo nimûne kêyn û le buwarî hestekî, bepê kat, le çi doxêkdayn. Boye pêkewebûnî nêwan gewreyek û mindalêk yeksan dernaçêt. Watakey debête jêrdesteyî mindal bo êmey serpereşt, serpereşt hem detwanêt daxwazî xoy pêşan bidat, hem sinûrî xoy destinişan bikat, belam mindal tenha detwanêt sinûrî xoy destinişan bikat. Nimûne, katêk mindal dawayekî heye û giwê lênagîrêt dest dekar be giryani û rakişan le ser zewî. Mindal twanay pêşandanî narazîbûnî xoy nîye, nimûne bilê be serpereşt: “Madam to emende bedireftarî legel min, bot nîye qaweket bixoytewe, her îsta bîrêje!”.

²⁶ Berhevî: nermekar, flexible.

²⁷ Peyvrûn: kesêk derbirînî rûne, aşkiraye.

Yan bîhêne berçawî xot, to emşew betemay dîdarêkî girîngît û bem boneyewe zor şadît. Pêş roştin, şêw legel xêzaneket dexoyt, belam leber hoyekî nadyar hêndêk zîzît, emeş wehat lê dekat nawinawe le mindaleket ture bît û qsey pêbilêyt. Mindaleket wek to natwanêt paş reftarî wa hestşkên bilê: “Nexêr, îdî bese, ew dîdarey betemayt lebîr xotî berewe, her îste deroyt û denûyt!”.

Katêk mindal hest dekat serpereşt giwê be meyl û arezûy ew nadat yan sinûrekanî debezênêt, be kardaneweyek nîgeranî xoy derdexat, wek dest be giryankirdin. Berokgîrîy bo serpereşt debête rêzgirtin le hestekanî mindal, nek hêrişkirdine ser bertek û xoderxistinî mindaleke.

Şêwazî corawcorî reftar legel mindal

Sê şêwazî reftar legel mindal heye ke min be neşiyawî dezanim. Yekem hejimûnî, dûhem kolder²⁸ û sêyem bêperwa.²⁹

Bepêy ezimûnî xom em sê şêwaze hîçyan şiyaw nîn bo ew kesaney deyanewêt yarmetî mindal biden bo geşe sendin lem civakey ême têyda dejîn - civakî torbendî perestên.

Le civakî heremî amancî serekî zorîney bawan perwerdekirdinî mindalî giwêrayel bû, her boye perwerdey hejimûnî diyartirîn şêwazî baw bû. Belam bawan qet natwanêt tenha yekêk lem şêwazane bekar bènêt. Rastyekew eweye bawanî hejimûnî hemîşe reftarî hejimûnî nîye û carûbarîş kolder yan pêçewaneyetî.

Perwerdey hejimûnî

Le civakî heremîda reftarî bawan legel mindal hejimûnî bû, emroş zorêk le bawan her bem şêwe legel mindal reftar deken. Em şêwaze mindal pelkêşî biryar û dawakarî bawan dekat, hawkat ewan çawenorin mindal geşe bikat û giwêrayeliş bêt.

Dekirêt bilêyn çawerwanî serpereşt le mindal zor rûne, belam le heman katda berpirsayetîy serpereşt be şêweyekî zor heremî ye. Boye zorbey mindalanî xawen bawanî hejimûnî dûdiln lewey bawaniyan xoşiyaw dewên. Hokarekey degerêtewe bo ew peyamey mindal le bawan werîdegirêt: “Ger to bem şêweye bît û bem core erikekanit encam bideyt daye û babe zor toyan xoş dewêt, belam ger to bepê arezû û daxwazî ême reftar nekeyt, diliman pêt xoş nabêt”.

Beşêwazêkî dîke: Mindal hest dekat ew xoşewîstey le bawanî werîdegirêt mercbende - ewey ême pêy delêyn “Xoşewîstî mercbend”. Wata peyamî xoşewîstî bawan bo mindal tenha katêke ke mindal be tewawî reftar û kirdarî bepê çawerwanî û arezûy bawanî bêt.

Bawanêk perwerdey hejimûnî û xoşewîstî mercbend bo mindalekey bikate binema, tenha pêsemî be pêwîstî û arezûwekanî xoy dedat. Eme debête hoy seriçalbûnî mindal bedûway wergirtinî xoşewîstî le bawan, xobextkirdin, ledestdanî xodîd, xobeha û sêregîrîy berûnferman³⁰ e.

Mebest le mirovî berûnferman takêke diyalogî derûnî rengdanewey hestkirdinî naxî rengirêj bêt be, hemû kes lemin girîngtîre! Bo nimûne mindalî berûnferman bem şêweye bîr dekatewe: “Min debêt giwêrayelî bawikim, dayikim û kesani dîke bim, heta ewan miniyaw xoş bûwêt! Serpereşt tenha katêk miniyaw xoşdewêt giwêrayelyan bim û bepê çawerwanî ewan reftar bikem. Îsta çawerwanî ewan çîye?” Mindalî berûnferman bem şêweye pirsîyar le xoy dekat.

Pêçewaney mirovî berûnferman debête mirovî derûnferman. Mindalî derûnferman³¹ fêrbûwe xoy behend bigirêt (Hokarekey bawanêke ewyan behend wergirtûwe), serncgîrdane le pêwîstî û sinûrî xudî tak. Ewan pirsîyar le xoyan deken: “Min çîm dewêt?”.

Katêk le Kamplêr Enîstîtwî Danmark seriçalî xwêndinî derûnsarêjîy bûm, mamostayekim hebû be nawî Mugns Lund ew wesfêkî ciwanî bawanî hejimûnî dekird. Deygut peyamî bawanî hejimûnî bo mindalekanî: “Min xomim û toş minî û ger to nebît be min bem ziwane detkem be xom. Hebûnî hevbendî û peywendî legel mirovî wek xom zor hasantîre!”.

²⁸ Kolder: bawanêk zû kol bidat beranber daxwazî mindal, tirsî ewey heye mindal geşe nekat! Encamekey debête mindalêkî serero û dûr le hestî hawsozî.

²⁹ Bêperwa: boy girîng nîye mindal geşe dekat yan ne, hestî deşkêt yan ne.

³⁰ Berûnferman: outer-control mirovî riwaletî, ferman le derewe werdegirêt, mirovî rû leder, tenha serencî gîre le layenî riwaletî, arastey gîre le rûkar û riwalet, riwalet biryarî bo dedat, riwaletperest.

³¹ Derûnferman: inner-control miruvêk ferman le derûnewe werdegirêt, serincî gîre le layenî derûnî, derik û lojîkî xoy biryarî bo dedat.

Puxtey perwerdey hejimûnî:

- Bawan sêreyan gîr kirdûwe le pêwîstî û sinûrî xoyan û çawerwanin mindalîş giwêrayel bêt.
- Serpereşt, berpîrsayetîy xoyan be şêwazî “Heremî, le serewe bo xwarê” cêbecê deken bêewey seng bo mindal dabinên.
- Serpereşt, bezorî ferman deden û seriqalî kontirolkirdinin ewîş le rêy sizadanewe.
- Pêwîstî û arezûy serpereşt pêşemî pêdedirêt û padaşte bo xoyan.

Mindalêk le perwerdey hejimûnîy bawan yan xêzanêk bexêw bêt, debête mirovêkî berûnferman. Encame here xembarekey debête ledestdanî xomtimane, lawazbûnî asayîştî naxekî û nemanî xobawerî.

Perwerdey kolder

Hêndêk bawan hen boxoyan le xêzanî perwerdey hejimûnî pêgeyîştûn, her boye nerimî beranber mindal deniwênin û hoşiyarin le bekarhênanî reftarî hejimûnî beseryanda. Encamî em nerimî niwandine lay hêndêk bawan way lêhatûwe hemû berpîrsayetî radestî mindalekaniyan biken û xoyan waz le berpîrsayetî bihênin, bibin be kolder. Lêreda kêşeyek serhelledat, mindal dezanin arezûy çî deken û çîyan pêxoşe, belam hemû kat nazanin pêwîstîyan çîye. Bo nimûne katêk bawan berpîrsayetîy xoy becêdehênêt, şewan peroşî katî nustinî mindalekeyetî heta têrxew bêt. Bepêçewanewe mindal le îstada dejît û hokarî mandûyetî sbeynêy peywest nadat be direngnustinî şewî rabirdûwe.

Ger bawan bilêt nexêr be mindal: “Min debînim to zor mandûy, îsta çêrokêkit bo dexwênimewe pêş ewey biûyt”, lêreda bawan berpîrsayetîy xoy le pêwîstî mindal heldegirêt û hawkat fêrî dekat xoy binasêt. Mindal dezanêt “Ger way lêhat, mandûwe”. Mindaleke fêr debêt wişeyekîş bo em heste destînan bikat, (Mandû).

Em şêwaze reftarey kolder legel mindalda, “Çît dewêt, çît pêxoşe?” helwêstî bawanêke çalakane le xizmetî mindaldan bo cêbecêkirdinî xwast û arezûyan, eme wayan lê dekat be rêjeyekî zor bêbeş bin le derfetî geşey sûdbexşî civakî û hawsozî.

Civakî torbend mirov pitir hoşdarî prosej jiyan dekat heta civakî rabirdû, lêreda tak zor car berokgîrî karkirdin legel kesani dîke le grûpêk yan torêk debêt. Emca twanay civakîy baş û hawsozî zor rolêkî zor girîng bo mirov debînet. Ew bawaney şêwazî perwerdey kolder bo mindalekey heldebijêrêt, wirçexizmet³² be mindalekey dekat.

Bawanî bêperwa be dûfaqî legel mindal danûstan deken, be ziman delên “Belê” be ceste delên “Nexêr” yan pêçewanekey. Hokarekey narastgoyî ewane beranber be meyl û arezûyan; Ewan raran, be kirdewe şitêk heldebijêrin, belam delên ew şite ewe nîye ewan deyanewêt. Katêk mindal berdewam hest bem danûstane dûfaqye dekat, mtimaney twanay civakî xoy le dest dedat. Boye yekem peyamim bo bawan xodîde be wişe meyl, pêwîstî û arezûy xot derbire, betaybet katêk legel mindaldayt, (Derûnferman be). Ewkat zimanî ceste û zimanî derbirînit yekangîr³³ debin û mindal hest be dilniyayî û asayîşt dekat û pêwîstî namênêt be lêkdanewey sîgnalî narûn. Hawkat ewan fêrî xobawerî û xodîd debin û le ast û bîrî serpereşt têdegen û dezanin babetekan têkbesten.

³² Wirçexizmet: metelêkî bawe le welatanî Skandînavya, le şiwênêkda bekar dêt mirov mebestî qazanc bêt, belam zerer bidat. Wek wirçêk ke xawenekey zor xoş dewîst, katêk xawenekey nusbû mîşêk le ser serî nîşt, wirçêke wîstî mêşêke derkat û be berd day beserî xawenekeyda û kuştî!

³³ Yekangîr: yekgirtinî dû layenî ziman û ceste, hawrewtî dû layen û mebest.

Eme nimûney serpereştêkî rastgoye derbarey xoy û ew peyamey deydat be mindaleke: “Min îste hezim lê nîye çîrokit bo bixwênimewe, biryarim dawê otombîlekem bişom. Ger to le şordinekeda yarmetîm bideyt, minîş paşan detwanim çêrokêkit bo bixwênimewe. Pêt başe?”

Katêk peyamî bawan derbarey pêwîstî û sinûrekanî xoy rûn bêt, debête hoy nêzîkayetî le nêwan bawan û mindal. Bo pêşandanî pêçewanekey dekirêt bilêyn rojêk to dûway kar dêtewe malewe be hawsereket delêt:

- To: Pêm xoşe emşew birome sînema, ray to çîye?
- Hawsereket: Ger pêt xoşe biçîne sînema, deroy. Betemay seyrî çî fîlimêk bikey?
- To: Min pêm xoşe çaw le fîlimî zoro bikem.
- Hawsereket: Zorbaşe, çaw le zoro dekeyn.

Paş tewawbûnî fîlimeke îwe le rêgey malewen:

- To: Bo le şiwênîk lanedeyn û xwardinêk bixoy?
- Hawsereket: Betemay le kiwê nan bixoy?
- To: Min pîzam pêbaşe, bo lew pîzaxane pîzayek nexoy?
- Hawsereket: Wa dekeyn.

Em nimûneye weha dête pêşçaw hawsereket zor sercirakêş bêt, belam min bepê ezimûnî xom paş çend welamêkî lem core bîrdekemewe ke legel kême? Em hawsere hemû peroşî becêhênanî xwast û arezûy mine û eme wa dekat ew lêm win bêt.

- Min dilniya nîm hawserekem pêyxoxe legelim bêt.
- Min dilniya nîm hawserekem pêyxox bû biçête sînema.
- Min dilniya nîm hawserekem pêyxox bû em fîlime bibînêt.
- Min dilniya nîm hawserekem meylî çûne derewey bêt.
- Min dilniya nîm hawserekem hezî le xwardinî pîza bêt.

Hestî mindalîş legel bawanêk hemû peroşiyar leser becêhênanî meyl û arezûwekanî mindalekeyan bêt, bem şeweyey serewe debêt, bêwey şiwênêk bo xoyan diyarî biken yan “Xohestyan hebêt”. Mindal legel bawanî wehada hest betenhayî dekat û nazanêt çî şiwênêkiyan le jiyânî xoyda bo diyarî biken. Beray min em şewaze reftare cêgey pejareye, leber ewe mebestî bawanî kolder lem hemû sazandin û becêhênanî tenha peroşî şadî û geşey mindalekeyetî.

Bawanî kolder û xolenawber wa rahatûn be wişe pêwîstî, sinûr û arezûy xoyan destînîşan neken, her boye mindalyan bepê têperbûnî kat ne giwê bo daxwazî, sinûr û pêwîstî ewan degirin ney hî kesî dîke.

Mindal be twanay hawsozyewe ledayik debêt, belam em twanaye deşêt kem bibêtewe yan be tewawî lenawbiçêt, ger mindal le xêzanêkda perwerde bêt serpereşt berûnî pêwîstî, peyam û hawsozî xoy beranberî dernebirêt.

Em rewte wa dekat mindal bepêy kat debine bûnewerî biçûkî xopesend,³⁴ yan wek bawe delên nazinazî.³⁵ Ewan handirawin tenha sêreyan gir biken le wîst û arezûy xoyan. Em mindalane derfetyan pênedirawe pêwîstî, sinûr, wîst û arezûy xelkî dîke hestpêbiken û ezimûnî biken.

³⁴ Xopesend: xowsît, kesêk tenha xemî xoyetî hîç şitêk derbarey wîst û hestî beranber nazanêt, herboye tenha xoy debînêt.

Bem core bawan beşî here mezinî berpirsayetî û rêberayetî mindal dexene estoy mindalekan û becêgey xohest, sinûr û pêwîstî xoyan sêre gîr deken le wîst û arezûy ewan. Encamekey debête behele le ser hsbakirdinî mindal, ger carêk ew nezanêt çî dewêt!

Nimûne: Lem rojaneda çûme dûkanêkewe xwardinî şêw bikirim, jinêkî gencim bînî legel mindalêkî temen 5 salan bedûway xwardinî şêwda degeran, giwêmlê bû dayik le mindalî pirsî: “Çî bikirîn bo şêw?” kureke welamî dayewe: “Nazanim” - katêk berdewam le dûkanekeda deroştin, geyîştine lay befirange³⁶ yek dayik pirsî: “Pêt xoşe masî bikirîn?” Kureke gutî: “Ne”. dayik pirsî: “Hembergerit pêxoşe?”. Kureke gutî “Ne”. dayik berdewam bû le pirsiyarkirdin û diyar bû taqetî pênema ke deybînî kurekey biryarî pênadirêt. Ke hatine şiwênî paredan bînîm kureke degirya û ruxsarî dayikî zor aloz û tûre diyar bû le katêkda baskî kurekey be tundî girtibû.

Pirsiyarî min lêreda eweye: Boçî dayikeke giwê bo kurekey ranegirt katêk welamî nazanimî dayewe beranber pirsiyarî, şêw çî bixoyan? Yan pêwîst dekat berpirsayetî wa bixirîte estoy mindal?

Pêmwêye em core beserhatane xeminakin, dilniyam hem dayik û hem mindal arezûy peywendyekî başyan pêkewe bû. Belam tenha awat û arezûy baş bes nîye. Ger ême bimanewêt peywendyekî baş legel mindal saz bikeyn hîç rêgeçareyekî dîkeman nîye bêcige le esto girtinî berpirsayetyan û rêpêdaniyan ke mindal bin wek mindal bijîn.

Lem beserhatey serewe “Kêşe” tenha dayik bû, kureke hîç tawanêkî nebû, dayikeke zor kolder û narûn bû. Ger dayikeke wîstbay rûn bêt beranber be kurekey, deypirsî: “Çît pêxoşe bo şêw?”. Ger welamî kurekey “Nazanim” bûwaye, deygut “Bo xom şitêkit bo heldebijêrim”. Ger gutbay: “Hembergirim dewêt”. dayikî deytwanî bilêt: “Bot dekirim”, belam min emro hezim le masye û masî bo xom dekirim.

Wa diyar bû dayikeke perosmendî meyl û arezûy kurekey bû, boye deywîst behendî werbigirêt. Ger waneba - boçî pirsiyarî lêdekird?

Peyvrûnî bawan birîtye le:

- Peyamî - min bekar bêne. Nimûne: “Min bestenîm dewêt”.
- Rastgo be legel xotda - ewey detewêt derîbire! Nimûne: “... Min demewêt şitêkî dîke bo xom bikirim”.
- Kesekî be - be wişe meyl, arezû, hest, bîr û ezimûnekanit derbire û pênasey xot bike. Nimûne: “Min emro masî dexom”.
- Le axawtinda konkirêt be, lebatî gîştgîrbûn. Nimûne: “Min hembergir bo to dekirim, belam şitêkî dîke bo xom dekirim (...) Min emro masî dexom”. Becêgey: “Dey, çend daneyek hembergir dekirim, belam lewaneye şitêkî dîkeş bikirim. Kesêk hembergir bixwat wirgî dête jan”.

Tenanet bawanî kolder her çende perosiminedîş bêt, her mindal tuşî nîgeranî û dilerawkê dekat.

Bawanî kolder zorcar be curling parents³⁷ nawzed dekirên. Bîhêne pêş çawt bawan lepêşî berdekewe (Mindaleke) heldêt û be geskêk pêşî bo xawên dekatewe û hîç berbestêkî bo nahêlêt. Lêreda sêrey bawan gîre le meyl û arezûy mindal!

³⁵ Nazinazî: benazperwerde, qet dilî neşkênirawe, hemû katêk beqsey kirawe.

³⁶ Befirange: sehaldan, mucemîde, firêzer ke xwardinî bestûy têda heldegirin.

³⁷ Curling: nawî yaryêke le welatanî skatlend û kenada. Yaryeke le nêwan dû grûp û le ser sehol dekirêt, beheldanî berdî xir û lus le ser sehol, yarıçyekan be gesk xêra, xêra berdemi berdeke pak dekenewe heta hîç berbestîk le pêşî nebêt û be xêrayî bigate amanc (gol). Lêreda bawanî kolder wesf kirawe be yarıçyek narêkî pêş berdî yaryeke pak dekatewe ta deygeyenête amanc.

Puxtey perwerdey kolder:

- Hemû sêrey bawan tenha gîre le meyl û arezûy mindal.
- Bawan basî pêwîstî, sinûr û meylî xoy nakat bo mindal û her boye derbirînî narûne.
- Bawan xoşewîstî xoyan le rêgey becêgeyandinî erik bo mindal beyan deken.
- Bawan le beesto negirtinî berpîrsayetîy mindal xoyan azad deken.

Mindal hest be naseqamgîrîy derûnî deken û begumanin le xoşewîstî bawan leber narûniyan. Ewan katêk legel bawandan hest betenhayî deken leber hoy nenasîniyan û nezanînî hîç şitêk derbareyan. Dewrûber em mindalane be nazinazî û xopesend denasin û her emeş debête dabiraniyan le civat.

Bawanî bêperwa

Grûpî sêyemî bawan leber hêndêk hokar griftarin bexoyanewe. Layenî derûnî yan doxî jiyaniyan corêke ke wize û taqetyan pê namênêt bo mindalekaniyan, mindalîş kem û zor berpîrsayetîyan dekewête estoy xoyan.

Min ezimûnî karim heye le zaroxane, fêrgey bineretî, beşî mindal le nexoşxane, senterî mindalanî bêbawan, kilînikî derûnnasîy mindal, senterî pêdagogîy Oslo û senterî pêdagogîy derûnnasî wek amojgar. Her boye lem mawe dirêjeda dîdarî zorim legel bawan hebûwe û detwanim bilêm her hemûyan mindalekaniyan xoşwîstûwe. Tenanet ewaneş ke mafî perwerdekirdinî mindalyan leber xemsardî lê wergîrawetewe. Belam bedaxewe hemû bawanêk twanay piyadekirdinî hestî xoşewîstî xoy bo mindalekey be kirdewe nîye, heta mindal hest be xoşewîstinî xoy bikat le layen bawanîyewe. Mercî pêdanî xoşewîstî peyweste be xoşewîstinî xudî takewe, (Xoy xoş bûwêt).

Wek berêweberî zaroxane, bawanim bînîwe twanay bexêwkirdinî mindalekey nebûwe. Betaybetî lebîrme kiçêkî 3 salaniman hebû berdewam biragewrekey ke 8 salî temen bû deyhêna û deybîrdewe bo malewe. Beyanîyekî sard piley serma lejêr dûwazdewe bû, em kure bê gorewî be cûtêk czimewe xoşkekey hêna bo zaroxane! Xoşbextane pêmzanî û xêra cûtê gorewî xurîm pêda lepêy kird. Qet ew nîga û çawaney ke pir le supas û pêzanîn bû lebîrim naçêtewe.

Her lem buwareda be ray min rexne girtin lem core bawane birîneke qultir dekat. Mindal zor wefadare beranber be bawanî xoy û zorîş hestyare derbarey boçûnî kesanî dîke leseryan. Her boye axawtinî nayetî û rexne le bawanî em core mindalane debête dû car sizadaniyan. Bepêçewanewe hîç hoyek nabête berbest bo bedûwadaçûnî mjarî xemsardî, betaybet ger to hest bikeyt mindaleke pêwîstî be yarmetye.

Maweyek lemewpêş sîmînarim bo stafî zaroxaneyek derbarey bawanî bêperwa saz kird, le pişûda hestêkî zor behêzim ezimûn kird, katêk piyawêkî genc hat û begerimî supasî kirdim le ber babetî simînareke. Diyar bû qsekan zor karî têkirdibû û basî dewranî mindalî xoy legel bawane bêperwakeyda bo kirdim. Ew be mindalî pênasîy mindalî lasar û nesaziyan le ser dana bû, pêy wabû stafî zaroxane û fêrge be hîç şêweyek neyandewîst le griftî ew têbigen. Deygut begencî zor serero bûwe, têwegilawe be madey hoşber û tundûtîjî. Ew supasguzar bû ke dûwatir yarmetî wergirtibû, wa berêz û hurmetewe banghêştî danûstan kira û her emeş waykird bo xoy têbigat le hokarî reftar û kirdarî. Handerî îşkirdinî ew le zaroxane yarmetîdanî ew mindalaneye ke leber her hoyek bêt griftyan legel xoyan û bawaniyan heye. Wîst û hîway dîdarî berêz û hurmetewe bû legel bawanî mindalekan û hawkat deygut hemîşe hokarêk heye bo her kirdar û reftarî her mirovêk.

Hêndêk car ezimûnî sextî kesêk debête rêgey rizgarî bo kesêkî dîke.

Puxtey bawanî bêperwa:

- Bawan yan serpereşt twanay xodîdî nîye, her boye natwanêt pêwîstyekeyanî mindalîş bibînêt.
- Bawan yan serpereşt berpîrsayetiş mindal nagirête esto.
- Bawan yan serpereşt twanay rêzgirtiniyan le sinûrî mindal nîye.
- Bawan û serpereşt be astem jiyani xoyan radeperênin.

Mindal berêjey kem ta zor hest deken kes ewanî xoş nawêt! Bem core bîrkirdineweye ewan twanay geşandinî xobeha û xodîdyan nabêt. Encame here nayetiyekey nemanî “Xorêz”³⁸ û emeş kêşey mezinî bo deafirênêt. Hawkat kesani dîkeş wek xoy reftarî legel deken û katêkîş ew natwanêt pêwîstî, wîst û sinûrî xoy behend bigirêt, kesani dîkeş behendî wernagirin, eger bextî yar bêt takêk doxekey debînêt û debête firyadiresî.

Bêperwayî katbend³⁹

Carêkiyan le pîşey derûnsarêjîy jinêk be mindalêkî şeş salanewe hate lam. Mêjûy jiyani eman nimûney çonetî jiyani bû le kat û doxî ciyawazda, carî wa heye bawan wize û taqetî le jiyanda pênamênêt bo kat terxankirdin û reçawgirtinî mindal, her boye mindal wa hest dekat bawan bêperwaye beranberî. Mêjûwekeyan dirêjey heye:

Dayikêkî genc û jinêkî hoşiyar katî lay min girtûwe, leber ewe zaroxane çendîn car skalay le ser şerengêzî û nesazî⁴⁰ kurekey pêgeyiştûwe û ewan pênasey “Nesaz” yan bo kurekey diyarîkirdûwe.

Katêk sê kesî gftugoman kird têgeyiştim bawikî kureke dû mang lemewber barubiney pêçawetewe û becêyhêştûn, îstaş legel jinêkî dîke dejît le şiwênêkî dîkey welat dûr le eman. Behoy dûrî rêgey nêwaniyan kureke natwanêt bawikî berdewam bibînêt. Jineke delêt ew her zû peymanî legel xoy best ke em biryarey bawikî kureke karîgerîy Leser danenêt, her boye neydehêşt be rewalek hîç nîşaneyekî pêwe diyar bêt. Ew wek pêşû berdewam bû le îşkirdin û hîç “Lawazî”yekî pêşan nededa. dayik delêt em rewalek ragirtine zor giran le serî kewtûwe, encamekey bû be bêzarî, werezî û xembarî, betaybet katêk le malewe debû.

Wek pêşû basiman kird mindal berêjey yekem wefadarin beranber bawaniyan, her boye girîng bû bo kureke peroşî dayikî bêt û berpîrsayetiş bigirête esto, katêk deybînî dayikî be astem jiyani xoy radeperênêt. Kureke boxoy le çsekanda emeyani selimand. Ew demey kureke le malewe bû girîng bû boy baştirîn layenî xoy pêşan bidat, bepêçewanewe katî zaroxane pêwîst bû hemû bêzarîy, xemî dûrkewtinewey bawik û wek xoy witi: “Xemokî dayikî le malewe” lewê birêjêt.

Le mawey gftugokeda jineke biryarîda ke debêt mtimane be kesêkî nêzîk le xoy bikat û katî tenhayî derûnî xoy bo bikatewe heta le katî xemokîda karîgerî nayeti nekate ser kurekey û paşan çareserêk peyda bikat heta kurekey berdewam peywendî legel bawikîda hebêt. Hawkat rêy pêbdirêt kardanewey hest û bîrî xoy be wişe bo dayikî derbibirêt. Îsta berokgîrîy dayik, rêzgirtine le hestekanî kurekey û derfet pêdanîyete heta hemû bîr û hestî xoy be wişe derbirêt bê ewey dayikî berperçî bidatewe yan parêzgarî le xoy bikat.

Paş çend hefteyek dayikeke peywendî pêwe girtim û deygut reftarî kurekey zor baştir bûwe le zaroxane û îsta zor kiraweye derbarey bîr û hestekanî. Bo xoşî îsta hestekanî xoy pitir be hend werdegirêt û rastgoyane û konkirêt basî hest û bîrî xoy legel kurekey dekat û emeş waykirdûwe

³⁸ Xorêz: rêzî xo girtin, seng bo xo danan.

³⁹ Katbend: wabeste be katî diyarîkiraw, maweyek.

⁴⁰ Nesaz: kesêk legel hîç şitêk û hîç kesêk nesazêt û hemîşe kêşe saz bikat.

hevbendî nêwaniyan zor nêzîktir, kirawetir û rûntir bin beranber be yek. Îsta îdî pêwîst be lêkdanewe û pênasekirdin nemawe û “Betewawî têdegem ke min ew maweye agam le kurekem nebûwe”.

Dayikeke îsta derikî bewe kirdûwe ke maweyek pêwîstî kurekey nedebînî û agay lê nebû, leber bêhêzî û griftarî xoy le jiyana. Kurekey deyust hawkarî dayikî bikat boye kêşey le zaroxane saz dekird.

Em nimûneye pêşanî dayn, katêk mindal şewazî reftar degorêt, nîşaneyê ke buwarêk le doxî jiyana tewaw nîye. Detwanim beşeweyekî dîke bilêm mindalî nesaz, bûnî nîye, mindal heye doxî jiyana nesaze.

Pirsiyarêk to debêt le xotî bikeyt katêk mindal reftarî guncaw nîye: “Em mindale deyewêt çî be min bilêt?” Ger mindaleke temenî 2 sal yan pitire, detwanî pîy bilît: “Min debînim to werezît, belam nazanim leber çî, ger detewêt min detwanim yarmetît bide”. Bem şewe mindaleke têdegat to hestit pêkirdûwe astengî heye û ew kirdarey lexoy deyniwênêt asayîye. Zor car dekirêt mindal tenha deyewêt hestî xoşwîstin werbigirêt yan bipejrênrêt û rêzî lê bigîrêt. Pêçewaney xoşewîstî nefiret nîye, çawpoşî lêkirdine.

Ger detewêt gorankarî bikeyt, lexotewe destpêbike

Min zorcar bawan debînim dûdîlî le corî danûstaniyan legel mindal, wek derbirînî xoşewîstî û diyarîkirdinî sinûrî rûn boyan. Zorbey bawan perwerdey hejîmûnî bêperwa û kolderin û ewan em şêwazaneyan welanawe, belam bijarey dîkeyan çîye?

Min pêmwaye bijareke reftarî hawbehayî û berawerd nekirdinî mindale legel gewrekan, hawkat zor esteme bawan be şêwazêk reftar legel mindal bikat ciyawaz bê lewey xoy ezîmûnî kirdûwe.

Bepê ezîmûnî xom bo ewey bitwanîm be şêwazêkî niwê reftar legel mindal bikem, naçar bûm agam le riwangey mirovî û behakanim bim heta em şêwaze niwêyey reftarim legel mindal nebête rêbazêk, belam reftarkirdin be şêwazêkî niwê le cîhanda. Şêwazêkî niwê û rastgoyane le layen minewe ke pile be pile le birbirey piştîda cêgîr bûwe.

Reftarkirdin legel mindal be şêwazî hawbeha û bê berawerd

Watay hawbehayî rêzgirtine le ciyawazîyekan, ger min bimewêt be şêwazî hawbehayî legel mindal reftar bikem, be wişe û kirdar pêşanî dedem ke min rêzim heye bo ciyawazîyekanîman û hawkat herdûkîman xawen yek behayn. Derbirînî min debête: “Min minim û to toyt, min bîrkirdinewe û hestî taybet be xomim heye, toş herweha û azadîşî le derbirînî hest û bîrî xot”.

Nimûneyek: Lem rojane bo kirînî xwardemenî çûme dûkanêkewe û bawanêkî gencim bînî legel kurekeyan ke pêdeçû sê salî pitir temen nebêt. Diyar bû kurekeyan zor çalak bû, giwêmed lê bu bawîk û dayîkî her deyangut: “Nekey, daynê, wa meke, destî lê mede, wazbêne...”. Be tonî deng û şêwazî derbirînî bawanî diyar bû bêzar bûn le reftarî kurekeyan. “Min silawim lêkirdin û witim wa diyare sertan zor qale”. Bawîkî welamî damewe û witi: “Belê, em kureman zor lasar û nesaze”.

Pêmwaye zor kes hen beserhatî wayan ezîmûn kirdibêt û yadyan bêtewe. Zorman carûbar mirovman be reftarî pêname kirdûwe. Ger witey em bawîke yek carekî nebêt û rahatbêt her bem şêweyey reftar legel kurekey bikat, hîç guman namênît ke kureke hest be kemukurî dekat û xoy le xaney çawerwanî bawîkîda nabînêtewe. “Kureke hest dekat, bew corey ke min hem, bawîkim minî xoş nawêt, wate hestekanim helen”.

Belam, bijare çîye? Ger em bawane hest be berpirsaretîy xoyan biken û sinûryan diyar û rûn bêt, bawîkeke deygut: “Belê, kurekem zor çalake û min deşlejêmed katêk legelî deçime nêw dûkanêkewe”. Ger em bawîke xoy behend wergirtiba, bêguman xoy nedexiste doxêkî weha bêzarkerewe. Deytwanî legel kurekey le derwey dûkaneke bimênêtewe û hawserekey binêrêt xwardin bikirêt, yan pêçewanekey bikat.

Pêşniyazêkî dîke, dekira her dû bawan û kureke pêkira biçine nêw dûkaneke, belam yekêkiyan tenha berpirsaretîy kurekey leesto girtiba ke diyar bû dilî bo zor şit lêdeda û ewî dîkeyan pêdawîstîyekanî kirîba. Diyar bû kureke bem reftarey serncêkî zorî bo lay xoy rakêşa bû, belam bawîk û dayîkî twanay danûstaniyan lew doxey ewî lê bû, legelî nebû, her boye ewîş kolî nededa.

Mindal wêneyeke lew cîhaney bawanî têyda dejîn. Katêk bawan mindalekey pêname dekat be “Lasar û nesaz” û berpirsaretîy hawahengî nêwaniyan dexate estoy mindaleke, wa dekat mindal hest be perawêzistin bikat. Katêk hawahengî nêwan serpereşt û mindal namênêt, hemîşe serpereşt berpirsiyare lêy, ewe serpereşteke twanay peywendî girtinî nîye legel mindaleke û reçawî nagirêt lew doxey lêyetî.

Salehay sale bawe katêk mindal reftarî nimûneyîye, delên bawanî zor taybetî heye, belam katêk pêçewanekey bêt (Mindal reftarî ne sazê legel daxwazîy serpereşt) delên mindalêkî nesaze û griftdare!

Hemû hawahengîy nêwan serpereşt û mindal yeksan nîye, leber ewe êmey serpereşt hem twanay destînîşankirdinî sinûrî kesekî xomanîn û hem pêşanîşî dedeyn. Nimûneyek bo em layene detwanêt leser ew bawike bêt ke pêştir basiman kird. Ew dekira sinûrî xoy bem core destînîşan bikat û be kurekey bilêt: Emro min zor mandû bûm le geran legel to lem dûkane”. Hawkat bawikeke deytwanî sinûrî xoy pêşanî kureke bidat û bilêt: “Êste min detbeme derewe û lewê çawerêy dayikit dekeyn”. Bepêçewanewe mindal tenha detwanêt sinûrî xoy destînîşan bikat, wek ew reftarey kureke deykir, belam em kure û mindalî dîkeş natwanin sinûrî xoyan pêşan biden, bo nimûne be bawaniyan bilên: “Êwe her qsem pêdelên! Madam ewende bedin legel minda, botan nîye seyri televizyon biken”.

Kureke helçûn û daçûnî bû le dûkanekeda, eme nîşaney çalakîy kurekeye û pêwîste bawanî reçawî bigirin û bizanin aya mandûwe yan helweday şitêke pêy bigat. Hokaî em reftarey dekirêt zor şit bêt, belam kurêkî temen sê salan twanay derbirîn û têgeyandinî bawanî nîye lew peyamey heyetî. Wata berpîrsayetîy bîrkirdinewe û dozînewey em peyame le estoy bawanîyetî, yan detwanin bilên: “Min nazanim çî wat lêdekat emende bêoqre bît, belam ger lem dûkane bitbeme derewe doxeke baştir debêt”. Katêk mindaleke peyamêkî wehay pêdedirêt hest dekat bawanî berpîrsayetî le esto degirin û perawêzî naxen. Ewan berûnî pêşan deden ke reftarî mindaleke hokaî çûne dereweyane le dûkaneke.

Mindal heta temenî 6 salî pêywaye hemû kes bîrkirdinewe û hestkirdinî wek ewe, boye tewaw siruştîye le her kat û satêkda, ger ew bîr û hestî kesî dîke reçaw negirêt. Hawkat mindal wişedanî kurt dênî leçaw serpereşt û twanay derbirînî bîr û hestî xoy nîye. Belam ger êmey serpereşt be wişe bîr û hestî xoman û ew hestaney le mindale û ber sernciman dekewêt derbirîn, em erike wîrdewirde lay mindal hasan debêt û emeş debête hoy geşey hestzîrekî.

Le serdêrî em beşeda hatûwe, “Reftarkirdin legel mindal be şêwazêkî hawbeha û bêberawerd”. Mebest çîye le bêberawerd? Bêberawerd birîtye le:

- Berpîrsayetî û rêberayetî mindal bigire esto û rê pê bide ba mindal bêt (Mindalayetî xoy bikat) nimûne: Serpereşt, bawan berpîrsayetîy xoy le hest, sinûr, pêwîstî û hemû babetî peywend be xoyewe be esto bigirêt, nimûne (Beserhatî kureke ke neydezanî çî helbijêrêt bo xwardinî şêw).
- Mindal têkel meke legel babetêk ger ew bijarey têda nebû. Bo nimûne, katêk bawanêk dêt mindalekey le zaroxane berêtewe bo malewe rêk pêş katî nustinî û lêy bipîrsêt “Detewêt biçînewe bo mal?” Em pîrsiyare lem kateda jîrane nîye. Mindal twanay şirovekarî û lêkdanewey leser dahatû nîye, paşan arastekirdinî pîrsiyar le mindal ger “Ne” bijareyek nebêt bêşûd debêt bo herdûla.

Puxte: “Reftarkirdin legel mindal beşêwazêkî hawbeha û bêberawerd”.

- Bawan hestekanî xoy û mindaleke depejrênêt û be hemû twanayewe agadaryetî.
- Bawan berpîrse le pêwîstî û sinûrî xoy be şêwazêkî hawbehayî.
- Bawan giwêradêre û behemû twanayewe tîdekoşêt le mindal têbigat.
- Bawan berpîrsayetîy rêberaney xoy deniwênêt û derfet bo mindal derexsênêt mindal bêt.

Pêwîste ewperî girîngî bidirêt be hest, pêwîstî û sinûrî hem serpereşt û hem mindal.

Ewkat mindal hest dekat: “Debînim bawanim behendim werdegirin û xoşimyan dewêt! Katêk reftar û kirdarim zadey derûnî xome, bawanim xoşewîstîm dedatê. Pêwîst nakat xom bikeme qurbanî yan wa biniwênim ke xoşewîstîm”. Eme wa le mindal dekat xomtimaney helkişêt û hest be asûdeyî bikat. Hokarekeşî hebûnî serpereştêkî resen û derûnfermane.

Riwangey miroyî min: Hemû kesêk ewey le twanaydaye deykat

Dîdarim legel zor kes kirdûwe griftarî kêşey jiyani bûwe. Bepêy ezimûn têgeyîştûm hemû kirdar û reftarêkî mirov hokarêkî lepişte. Boye delêm, hemû kesêk ewey letwanaydaye deykat.

Bo şirovey riwangey xom demewêt basî jinêk bikem be nawî Karîy, yekêk lew kesaney le seretay destpêkî pîşey derûnsarêjîm lay min derûnsarêjî werdegirt. Katêk bo yekemîn car hat bo lam, bînîm jinêkî genc, qelew be qij û pêstî çilkin, kirasêkî pirteqalî û cûtêk çekime⁴¹ hate jûrekewe. Ewkat min helgirî riwange û dîdî bawanim bûm, riwangeyekî polênêkî⁴² û dawerîy.⁴³ Her lem riwangewe be xomim gut, dekirêt mirov bem core berg û ruxsarewe biçête nêw xelk? Em bergey le kiwê peyda kirdûwe? Boçî qijî naşwat? To bilêy îste bonî neyet?

Paş hêndîk gftugo legelî têgeyîştîm çende mirovêkî ciwane, hem xawen hawsozye û hem zor xoşmeşirebe. Katêk mêjûy xoy bo gêramewe, em bîrem be mêşkda hat, ger ewey beser to hatûwe beser min bihatbaye bêşk cil û ruxsarim le hî to baştir nedebû. Derkewt ke bawanî Karîy twanay xoşewîstî pêdaniyan be Karîy nebûwe. dayikî ew be dirêjayî temenî mindalî Karîy her hereşey lêkirdibû, “Ger reftarit baş nebêt” min derom îdî qet nambînîtewe. (Mindal birwa be hemû qseyekî serpereşt dekat). Deygut qet aşina nebûm legel bawikim, “Ew kabirayekî pert û bêaga bû le dewranî mindalî minda, îsta ne min ew denasim û ne ewîş min denasêt”. Karîy le layen bawik û dayikîyewe perawêz xirabû, her boye ewîş fêrbibû xoy perawêz bixat. Le nêw civatda xelk bew corey Karîy çawerê dekird reftaryan legel dekird (Ew tenha em şêwaze fêrbibû). Le zaroxane serpereştekanî perawêziyan dexist, le fêrgey seretayî û nawendî çepênirabû. Paşan mêrdî be kabirayek kirdibû ewîş derkewt rêk heman reftarî legel dekird ke xoy çawerwan û be şayanî dezanî. Ew katey hatbû bo lay min ledest mêrdekey helatbû û zor detirsa peyday bikat. Beserhatêkî zor dijarî hebû, naheqî nebû ruxsar û bergî lebîr biçêt. Jiyani ew giyan derbazkirdin bû.

Zor car ke legel kesî wek Karîy gftugo dekem bîrdekemewe û bexom delêm: Ew hemû mirove dilovane û sozdare le kiwên? Hokar çîye ke kes kardanewey nîye û hîçî bo nakirêt?

Pêmwaye bedaxewe ême giwênedan û çawpoşîkirdiniman lê bûwete nerît, katêk debînîm mindal le doxêkî diwardaye. Delêyn: Baş debêt! Mindal xoragire berge degirêt! Min berpîrsim nîm le rizgarkirdinî em mindale! Sereray eme, hokar herîştêk bêt ke em bêperoşî serpereştariye le mal û le şiwêne giştyekan rû dedat bêwey kes xoy têbigeynêt, min ram waye katî hatûwe agadarî ew mindalane bîn ke leber her hoyek bêt doxî jiyaniyan diware.

Hemû kesêk ewey le twanaydaye deykat. Belê, belam bedaxewe zorêk bawan, staffî zaroxane yan serpereştî dîke hen ew xoşewîstî û rêzgirtiney le mindalî degirin, mindaleke têr nakat. Ewan pêwîstyan behendgirtinî hest û soz û rêzgirtiniyane.

Pêşmercêk bo ewey bitwanî legel mindal reftar be şêwazêkî hawbeha û bêberawerd bikeyt, pêwîste dîdêkî bê dawerîyt hebêt beranber be mirov. Min, ke mindalî civat û keltûrêkî dawerîym, salanêk bexoda roçûm heta twanîm kotayî be dîdî dawerî û rexnegirtin le gewre û mindal bigirim. Becêgey bîrdekemewe û delêm, “Çî waykirdûwe to bem şêwaze reftar û kirdar binwênît...? Yan detewêt bem reftaret çîm pê bilêyt?”.

Lebîrme katêk destimkird be pêdaçûnewe be bîr û dîdî dawerîymda û têdekoşam dîdêkî niwê bedest bênim, biryarimda gutey nabecê ne derbarey kes, ne be kes bilêm. Le destpêkda serim sûrma lew hemû carey pêşim bexom degirt le gutey nabecê û şikêner be xelkî. Ewa zor demêke min destim bem projeye kirdûwe û wîrdewirde hest dekem em dîde niwêyem debête beşêkî gewre le minda, boye îsta hest be nêzîkayetiyeke niwê dekem legel ew mirovaney deyanbînim û ewaney pêm xoşe lenêw

⁴¹ Çekime: czime.

⁴² Polênêkî: categorize kesêk hemû şitêk polên bikat, rwangeyekî polênkiraney hebêt.

⁴³ Dawerîy: judge kesêk ke hkum dedat beser xelkda, xelk mehkûmkirdin bêwey keseke binasêt pênase diyarîy dekat bo xelk.

jiyanimda bin. Bepê ezimûnî pêşûm, katêk mindal û gewrem polên dekird ewanim wek mirovêk ke hebûn nedebînî, belkû pênasem dekirdin û şiwênim bo dadenan!

Dîd yan riwangey to ger le hoşiyarîyewe bêt yan ne, karîgerîy heye le hemû dîdar, reftar û kirdarit legel kesanî dîke. Leber ewe dîdî to beranber be mirov, behakanî to destînîşan dekat.

Behakanî to - rastyekanî toye

Beha çîye? Behakanî to: Koy bîr û riwangey to pêkhênerî ew behayaney to helgirî heyt û bemeş cîhan debînî.

Çonetî reftarî to legel mindal û siruşt, rengdanewey riwange û boçûnî toye beranberyan. Berêzewe reftaryan legel dekeyt yan bêperway beranberyan?

Behakanî to beşêkî girînge le pênasey to, le rastîda beha pirînsîpe bineretyekanî şarêyî jiyanî toye. Sereray eme zor mirov hen betewawî agayan le behay xoyan nîye yan naynasin. Bo nimûne sîstemî behay to biryar dedat çî pîşeyekit hebêt, çî hevalgelêk helbijêrît, çon reftar legel xoşewîsteket yan mindalda bikeyt.

Detwanîn be corêkî dîke bilêyn sîstemî behay kesekî toye dinet dedat kirdar biniwênî û be şewazî taybet bexoyîşt biniwênî. Boye zor girînge behay xot binasît, betaybet katêk amancêk bo xot destînîşan dekeyt. Behakanit le bijare û prosej rewî rûwew amanc rengdaneweyan debêt.

Her boye zor girînge mirov bexoda biçêtewe û behakanî rengirêj bikatewe. Bo nimûne min zaroxaneyek pêdezanîm em behageley kirdûwete binewan:

Rêzgirtin, peroşmendî û çalabûn le hevbendîmînda!

Bêguman watay wişekanî behay rêz, peroşmendî û çalabûn le hevbendîda - ciyawazîy heye hem bo bawan û hem bo karmendanî zaroxane. Boye behend wergirtin û gftugokirdinî û radey têgeyîştinî tak lêyan girînge. Bo nimûne mebestî tak le rêzgirtin çîye? Behay peroşmendbûn pitir pêşemî pêdedirêt le rêz? Em behagele beriztirin yan nizimtirin le çalabûn le hevbendîda?

Zorbey mirov bîrûray konkîrêtî xoyan heye derbarey em behagele, belam gftugokirdinî em çemikane le layen bawan û karmendanewe û ragorîneweyan sûdbexê debêt. Dekirêt be pirsîyarkirdin lexot hendêk rastî bixeyte rû: Çon bizanim em behaye parêzirawe?

Ger bo nimûne min bimewêt behay peroşmendbûn le hevbendyekanî xomda pêşan bidem, detwanîm lexom bipirsîm: Çemikî peroşmendî çî watayekî heye bom min? Çon peroşmendî pêşanî mindal bidem? Çon peroşmendî pêşanî bawan bidem? Çon peroşmendî pêşanî xoşewîstekem bidem?

Yan ger bimewêt behay rêz le hevbendyekanî xomda pêşan bidem, detwanîm le xom bipirsîm: Min çî watayek dadenê bo rêz? Çon rêz le mindal degirim? Çon rêz le bawan degirim? Çon rêz le xoşewîstekem degirim?

Beha pêşemîdane; Şitêk le şitêkî dîke girîngtîre. Bo peydakirdinî girîngtirîn behay bawan, bo nimûne wa biniwêne to tenha yek behat pê desteber dekirêt. Kamyan? Kam beha debête jimare dû, sê û...htd. Mirov hen xawen behay kemin. Hî waş heye hest deken zor şit girînge bîparêzin heta asûde bin.

Zaroxaneyekî ehlî le komonî nêso din berêweberekey ke xawenî zaroxanekeye çîwar behay bem şewaze şirove kirdûwe.

Zaroxaneke sê beşe, le rarewî her beşêk beha binemayekanî zaroxane be nûsirawe heye. Bem şeweye behay rewî kar lem zaroxane aşkiraye bo hemû takêk bête îre. Ew beha binemayîyaney em zaroxane kirduye be şarê herheman behaye ke min kirdumete qîbilenimay xom.

Beha binemayekan:

- Mindal, karmend, bawan û hemû takêk hawbehan.
- Rêz le hemû hestêk degîrêt - hîç hestêk hele nîye.
- Serpereşt berpirsayetîy rêberane degîrête esto û rêdedat be mindal, mindal bêt.
- Lêre sêre gîre le proseş pêşweçûn - nek le amadekirdinî encam.
- Ragorênewe û diyarîkirdinî beha - binemayîyekan le naw xêzanda zor sûdbexşe, leber ewe to pitir agadar debît ke le jiyânî rojane girîngî be çî bideyt.
- Tenha kesêk to bigorêt xotî

Min rêzêkî zorim heye bo ew bawaney deyewêt be şeweyekî pesend reftar legel mindalekey bikat, ciyawaz lew reftareş bawanî xoy legelyan kirdûwe. Carêkiyan bawikêk hate lay min bo amojgarî û derûnsarêjî wergirtin, ew deywîst hevbendî nêwan xoy û dû mindale temen 5 û 3 salanekey baştir bikat. Deygut şewaniman lê debêt be ajawe, mindalekan giwê mênagirin û hemû carêk begiryan kotayî dêt û emeş wa dekar min hestî bawikayetyekî başim nebêt. Min pirsîm bo nimûne, to çon legelyan dedûwêt katî detewêt didaniyan bişon. Welam: “Îsta debêt bên û didantan bişon”. Lêmpirsî: “Kê delêt?”, hêndêk be sersûrmanewe çawî lêkirdim û witî: “Mebestit çîye?” Pêmgut ger to detewêt mindalekan bên didaniyan bişon, pêwîste legel xotda rastgo bît derbareş ew peyameş deydeyt. Wek: “Min demewêt îwe îste bên û didantan bişon”.

Bilê: “Min demewêt” yan “Min namewêt”, ewkar peyameş to zor rûntire! (Paşan pitir debareş em babete dedûwêyn).

Ezimûnî dayikêk degêrmewe ke katî xoy legel min seriqalî xwêndinî derûnsarêjîy bû le Danmark. Boy gêramewe rojêk em dayike legel kurekey be otomobîl deçine bazar, dayik be kur delêt: “Min demewêt to legelim bêyte nêw dûkanekewe”. Kureke be nîgayekî bêzarîyewe be dayikî delêt “To detewêt û to detewêt... Minîş zor şitim dewê!”. Zorcar wehaye katêk êmey mirov demanewêt be şewazêkî niwê reftar bikeyn, têdekoşîn bepê twana em reftare niwêye cêgîr bikeyn. Boye carî wa heye be hoy ziyaderoyîyewe pêş zerermend debîn. Pêmwaye welamêkî baş bo kureke lew doxeda debête:

Bibûre, min dezanîm to hest be bêzarî dekey lem şewe derbirîne, min demewêt rabêm le bekarhênanî em cor axawtine. Bo xom hest dekem zorî bekar dênim, supas bo ewey bebîrim dênitewe ke lêt bipirsîm “To çît dewêt?” Yan “Min pêwaye to legelim bêyte nêw dûkanekewe zor baştire lêre danîşt, pêş xoşş legelim bît?”.

Le rêgeş taqîkirdinewewe fêr bibe

Berokgîrîy mezin bo toy serpereşt reftarî hawbehayê legel mindal (Hestekanî mindal û to yek behayan heye), belam nabêt berawerd bikirên, (To riskawît, berpirsî le rêniwênî û rêberayetyî mindal). Belam reftarkirdinî legel mindal be şewazêk ciyawaz leweş xot wek mindal ezimûnî kirdûwe asan nîye. Terikkirdinî reftarêk le nexda çeqî bestûwe û bûwe be xorewt (Otomatîk) katî zorî dewêt. Bepê ezimûnî xom em erike çendîn sal dexayenêt û bîrkirdinewe lem mewda dirêje be asanî kol be mirov dedat.

Peyamî min bo to: Rê bide be xot ke le rêgeday! Katêk peş debeyt be wite yan şitêk ke to biryarit dabû be şewazêkî dîke cêbecê bikeyt, şad be peybirdûwe be şewaze koneke û meylit heye wazî lê bihênît. Peybirdinî be şewaze koneke, belgeye bo ewey to le rêgeday!

Bepê ezimûnî katêk be şewazî hawbeha û bêberawerd legel mindalim, debînîm pêkewebûniman pire le xoşewîstî dûlayene. Mindal be zîrekî civakîyewe le dayik debîn û dilovanin, ewan le ziyadeş xoyan

debexşin katêk legel serpereştî xawen twanay civakî û dilovanîn. Mindal tekdanewey toy bawanin. Şêwazî reftarî to legel mindal, debête şêwazî reftarî mindal beranber be xot.

Min arezûy serkewtinit bo dexwazim le rêgey karkirdin legel xot û rêzêkî zorim heye bo hemû ew kesaney em berokgîrîye heldebijêrin. Xogorên erikêkî qurs û bûwêraneye bo mirovî riskaw. Ger to hest dekeyt şêwazî reftarit legel mindal wek bawan şayste nîye, hokarekey degerêtewe bo ew katey xot mindal bûyt û em reftaret bo parêzgarî beranber serpereştekanit kirdûwe. Ewan yan hestekanî toyan nadîde girtûwe yan rêziyan bo sinûr û pêwîstîyekanî to nebûwe. Xogorîn yan xoladan le reftarî naşayst pêwîstî be berxodan û kolinedane.

Bawan yekemîn mamostay fêrkarî mindalin

Katêk segman kirî pêyan gutîn, ger bimanewêt şitêkî fêr bikeyn pêwîste pêş ewey temenî bigate yek sal fêrman kirdibêt. (Em qseye zor bawe, delên dûwatir zor sexte fêr bikirêt, belam estem nîye).

Bo katêk mindalim bû kes pêy negutim kateket sinûrdare bo fêrkirdin?

Yekemcar destim be xwêndinî derûnsarêjîy kird bîstim bawan tenha detwanêt pêş temenî 12 salî karîgerîy Leser mindal hebêt.

Temenî mindalî dekirêt bê wirdekarî dabeş bikirêt be ser sê qonaxda, le her qonaxêkda mindal pêwîstî bineretî heye. Yekem qonaxî temenî sawayetîye, dûhem temenî 3 salî heta 12 û sêhem temenî 12 bo 20 salîye. Mindal le temenî 3-12 zor berşikane, hokarekey giwastinewey temenîyetî le qonaxî sawayî bo mindalî lewêşewe bo herzekarîy.

Mindal le rastîda mindalî êmen heta degene temenî 12 salî

Mindal le 12 salî berayî temenîda rojane narastewxo pirsiyar arasteman dekat derbarey xoşwîstin û reçawgirtiniyan. Mebestim le pirsiyarî narastewxo şêwazî pirsiyarî nakirdarye yan neguncawe. Bo nimûne pêt delên: “To bedît”. Em witeye le cîhanî mirovî riskawda watakey debête: “To minit xoşdewêt?”. Bo nimûne bawanêk em core derbirîne têdegat detwanêt bilêt: “Min namewêt to pêm bilêyt bed, belam dezanîm to tûrey. Tûrey lêm?” (Bem şêwe bawan wişey bed nadîde degirêt, nek hestî mindaleke).

Ger bawan kardanewey konkirîtî bo gutey mindaleke hebêt, mindaleke nadîde degirêt û delêt: “To bo xot bedî, gemje”, lère (Kê gewreye û kê mindale?). Yan delêt: “To zor bêedebî”. (Mindal hemîşe bawanî be cddî werdegirêt, ew fêr debêt: Min bêedebim!) Yan pêdelên: “Bo derewe, to zor nesaz û pirkêşey”. Lère bawan mindal nadîde degirêt û perawêzî dextat. Pêçewaney xoşewîstî nefiret nîye, nadîde girtine! Katêk mindalêk perawêz dexirêt, hest dekat bawanî ewî nawêt û hestî xo be mirov nezani le derûnîda beranber bawanî dirust debêt. Betaybet ger mindal lelayen kesêkî girîngewe nadîde bigirêt hest be serlêşewawî û xemokî dekat.

Nimûneyek: Carêkiyan piyawêk hat bo lam birînî kon sarêj bikat, ew gutî xemî mindalî way lêkirdûm twanay derbirînî hestî şadîm bo hîç şitêk lem temeneda nîye. Deygut bawikî napak bû beranber be dayikî. dayikîşî le dûway ewe zor tûre û dijwar bûwe, tenanet dirawsêkaniman, karmendanî zaroxane û xelkî dîkeş perêziyan le dayikim degirt. Em û dayikî le xanûyekda dejiyan û hêndêk car dayikî werez debû destî dekird be zirîkandin û lêdanî em. Em piyawe temenî dewranî mindalî wek tirsêkî berdewam pir le xem û dûr le şadî webîr dêtewe.

Em piyawe deygut katêk temenî çiwar sal bû beserhatêkî ezimûn kird ke her kat bikewête yadî tezûyek dêt be leşîda. Ew le zaroxane bû, le yadîye xoy gemehevalêkî nawdar nebû lewê. Belam katêk le baziney beyan be helkewt le tenîşt yekêk le kure nawdarekan danîştû, lepir herdûkiyan destyan be axawtin kird. Ew emende xoy be şad û serferaz dezanî lem peywendye ke be hemû şitêk pêkenînî dehat. Heta kure nawdareke dengêkî seyrî derhêna û bûwe hoy pêkenînî berdewamî em ke be hîç şêweyek neydetwanî xoyrabigirêt. Yekêk le serpereştyaranî zaroxane betûryewe pêyda norî, hesta le ser kursîyekey û baskî emî be tundî girt û birdye goşey jûrekewe be tundî le ser kursyekî biçkoley dana û witî: “Lère dadenîştî û yek dengit lêwe nayet”. Em piyawe ke îsta temenî 40 sale be zarî⁴⁴-yewe em beserhatey mindalî xoy degêrayewe. Ew deygut wam leyade delêy dûwênê rûydawe.

⁴⁴ Zarî: giryan, şîwenî bekul.

Mebestî min le gêranewey em beserhatane destînîşankirdinî dû şiwênî ciyawaze le cîhanda. Êmey bawan pitir xulyay beşdarî û selimandinîn, keçî mindal xulyay xoşwîstinin le layen bawan û serpereşt û selimandinin le layen mindalî dîkewe. Berokgîrîy bo gewrekan eweye debêt têbigen tenha ewanin agadarî em ciyawazîyen. Le kotayî em kitêbe pitir basî em babete dekeyn: Çon sinûrî xoman destînîşan bikeyn bêwey mindalî pê bişkênîn?

Qonaxî yekem: Dû salî seretay jiyânî mindal

Mindalî sawa le dû salî seretay jiyânîda betewawî wabesteye be peroşmendî. Lem maweda mtimaney bineretî mindal deçespêt, yan pêçewanekey rûdedat ke hatûwete cîhanêkî dilovan û lêre mirovekan peroşî minin leber ewe min pirbeham boyan.

Mindal be mtimaney jîngey dewrûberewe ledayik debêt. Bedaxewe ger mindal em mtimaneye le dest bidat bebê renc boy nagerêtewe. Way dabinêyn mindalêkî sawa le xew radeperêt û dest begiryan dekat, dayikî be aramî mindaleke le amêz degirêt û qsey legel dekat. Paş daybî gorîn û şîrpêdanî çêj le pêkewebûniyan debînêt, qsey legel dekat û serncî gîre le kardanewe û sîgnalî mindalekey heta deniwêt û be aramî le şiwênî xoy daydenêtewe. Îsta mindaleke be asûdeyî deniwêt û mtimaney heye be bawanî, ger bexeber bêt ewan lewên û yarmetî deden.

Belam katêk doxî bawan legel xoy yan jîngey baş nebêt be asanî bêzar û werez debêt. Mindalî sawa le doxî wada hest be bêperoşî û bêhawsozî le layen bawanîyewe dekat. Ger em doxe bedegmen rûbdat karîgerîy nabêt Leser mtimaney mindaleke. Belam ger berdewam bêt wîrdewirde mindaleke mtimaney be bawanî namênêt, ger mindal bigirî û hest bikat kes be hanayewe nayet, waz le giryan dênî û radêt ke: “Hest û pêwîstî min girîng nîye”. Mtimaney bineretî lawaz debêt û xoy deguncênêt.

Mindal bêsinûr hestyare beranber doxî derûnî bawan. Ger bawan bêoqre bû, bêoqreyeke degiwêzêtewe bo mindaleke. Le doxî wehada mindalî sawa wizeyekî zor bekar dênêt bo bêoqreyî derûnî xoy, emeş debête hoy şirovey nadirustî bawan le ser pêwîstî mindal. Bo nimûne: Ger mindal le amêzî bawanî dûway şîrpêdanî biniwêt bawan wa dezanêt îdî mindaleke tere, dûway satêk dîsan bexeber dêt û bawanî bêzar debêt. “Emca çît dewê, ha?”.

Qonaxî dûwem: Le temenî 3 salî heta 12 salî

Le konewe temenî sê salaniyan be temenî lasarî bo mindal nawzed kirdûwe. Emro zor kes têgeyîştûn le temenî sê salîda çî rûdedat, boye nawyan gorîwe be temenî serbexoyî. Eme watay nawgorîn nîye, belkû têgeyîştine le bertek û geşey mindal lem qonaxeda. Ewey girînge em qonaxe debête hokarî gorankarî reftarî ême beranber be mindaleke.

Katêk mindal degate temenî serbexoyî, têdegat gutinî ne yan namewêt zor şitî bo degorêt. Mindal kem kem ezimûn dekat takêkî serbexoye û detwanêt sinûrî kesekî xoy diyarî bikat, her boye bîrdekatewe: “Eme şitêkî siruştîye pitir perey pêbdem”. Layenêkî serncirakêş ewe ke bawan û tenanet serpereştîş beranber em qonaxey geşey mindal lasarî deniwênin. Detwanîn be corîkî dîke bilêyn: Bawan lem qonaxe reftaryan zor req debêt beranber be mindal wek çon xoyan le qonaxî serbexoyî xoyanda reftaryan legel kirawe awaş reftar legel mindal deken. Bezorî perwerde le neweyekewe degiwêzirêtewe bo neweyekî dîke!

Berokgîrîy lewedaye twanay dîtinî nîşaney reftarî mindalit hebêt û têbikoşît hokarekey peyda bikeyt: Bizanît mindal deyewêt çît pêbilêt û her ewdem derikî bikeyt. Ger to têngageyt le peyamî mindaleke, pêybîlê to pêt xoşe lew têbigeyt. Bo nimûne: “Min debînim to natewêt bimdûwênît û nîgeran diyarît. Çît dewêt bot encam bîdem?” Bem core ne deyişkênît û ne hestî birîndar dekeyt, belam bem peyame be mindal delêyt to arezûy têgeyîştinit heye û peroşî ewît. Be watayekî dîke debête nebûnî bertek

beranber be wişe, belam bîrkirdinewe le hokarî bertekî mindaleke beranber xot, çî wa dekat mindaleke wişey bed bekar bihênêt û dûrît lê bigirêt.

Dostêkim heye dayikî kurêkî pênc salane katêk wîstyan pêkewe biçine lîstokifroşî⁴⁵ bo kirînî diyarî boy, eme rûyda: Kureke daway le dayikî kird lîstokêkî taybetî bo bikirêt, dayikî le welamda witî ew lîstoket bo nakirim. Kureke dîsan pêdagirî kird û witî hemû hevalekanî zaroxaney ew lîstokeyan heye, dayikî dûpatî kirdewe ke nayewêt ew lîstokey bo bikirêt. Belam ew pêşniyazî pêdekat bo xoy pare paşekewt bikat û bo xoy bîkirêt, ger pêxose. Kureke pêşniyazî dayikî bedil nebû, her boye destîkird be nasiza⁴⁶ gutin be dayikî: *To bedî û det şitêkim bedilî xom bo nakirît û htd...*

Dostekem boy gêramewe îsta ew fêrbûwe û twanay çiyakirdinewey hestî kesekî heye û têkelî nakat legel kêşe, (Hunerî çiyakirdinewey hestî kesekî legel kêşe) boye em core rûdawane be ezimûnêkî başewe kotayî pêdênêt. Her boye ew le welamî nasiza gutinî kurekeda gutî: “Min namewêt pêm bilêyt bed, belam têdegem to nekirînî em lîstoke be kirdarêkî bed debînît”.

Dostekem delêt katêk min bem şêwaze legel mindalekem reftar dekem- be wişe bîr û hestî xom derdebirim û hawkat hestî kurekeşim deselimênim- boye hemû diyardeke wek balonêk deçêt hewakey lêderkey û fiş bêtewe, bêzarîy kureke dademirkêt. Zemîney ew reftarey dostekey min legel kurekey debête, “Min tom xoşdewêt, belam îsta ew yarîyet bo nakirim”.

Ger mindal heta degene temenî 12 salî bew encame bigen ke bawan rastgoyane ewyan xoşdewêt, debine xawenî behayekî bêsinûr bo temenî riskaniyan. Derikkirdin be “Xoşewîstî bawik û dayik û pêzanîni sereray ewe bawanî hemîşe dilxoş nîn be reftar û kirdarî” debête binemayekî baş bo geşekirdinî û hoy sêregîrîy tewaw le rewî jiyani. Eme ezimûnî mindalêke xoşewîstî bêmerci pêdirawe. Em xawenî bawanêke be şêwazî hawbeha reftaryan legel kirdûwe, bêwey berawerdî biken be xoyan. Sernc bide em mindalane çende bextyarin, ewan dirêje bejiyan deden be xorêz û serberzîyewe. Ewan xawenî rêjeyekî zor le xohest û hestzîrekîn û herdem amaden bo berokgîrîy niwê! Em mindalane astî helkişanî geşeyan zor berze.

⁴⁵ Lîstok: kelûpelî yarîpêkirdinî mindal.

⁴⁶ Nasiza: gutey naşîrîn, naşayste, narewa û ciwêndan. Birwane “*Ferhengî Xal*”.

Mindal pêwîstî be bawanî helebeder û nimûneyî nîye

Bêguman mindal pêwîstyan be bawan û serpereştî helebeder nîye, belam pêwîstyan be bawanêke ke bepê twana le pênwawanda têdekoşêt.

- Reftarkirdin legel mindal be dîdêkî nadawerî:⁴⁷ Hemû kesêk ewey le twanaydaye bepêy dox û pêşmercî xoy deykat.
- Agadar be le reftarit legel mindal û çonetî dîdar û karlêkî le ser hestekaniyan beranber be xoyan.
- Be şêwazêkî hawbeha reftarkirdin legel mindal: “Hestekanî min û to yek behayan heye”, lebîrit bêt rêberayetî û berpîrsayetî erikî toy serpereşte.
- Be xoşewîstî bêmercewe legel mindal reftar bike, becêgey dawerîy, pênasekirdin û naw natore, rabimêne Leser reftaryan.
- Zimanî kêşefirên⁴⁸ bekarmehêne (Lekotayîda basî dêt), û hestekanî xot û mindalîş be wişê derbibire û destinîşanî bike.

Bekurtî em şêwaze birîtiye le perepêdanî hestzîrekî mindal katêk legel bawanî peyvîrûnin. Bawanêk ke hem rêz le hestî xoy û hem hestî mindal degirêt, hawkat bûwêre, kirawe û rastgoye derbarey kesayetî û doxî derûnî xoy bêewey derbirînî şikêner bekar bihênêt. Wate bawanêke berpîrse le peyv û şêwazî xobeyankirdin, em layene biryardere derbarey birîndar nekirdin û neşkandinewey hestî beranber.

Belam çon bem şêwaze reftar legel mindal dekeyt?

Lem beşey kitêbeke basî hêndêk hokar dekirêt bo yarmetîdan, ger kesêk wîstî be şêwazî hawbeha legel mindal reftar bikat bêewey berawerdî bikat legel xoy.

Mindal qedirzanî bawanî xoyanin

Bawan girîngtirîn kese le jiyânî mindalda û peywendî hestekî tundutolî legelî heye. Wek mamostay zaroxane pîşeyekit helbijardûwe biryardere le ayendî mindal, ew şêwaze reftarey to legel takî mindal deykeyt biryar dedat ew hest bikat reşawgîrawe yan perawêz xirawe. Demewêt derbarey em layene beserhatêkî xomtan bo bas bikem katêk be lay zaroxaneyekda têperîm: Behelkewt dayikî yekêk lew mindalaney lem zaroxaneyê denasim, kurêke temenî çiwarsale, nawî Lukase û dezanim ruxsarî çone, belam ême yekdî nanasîn.

Katêk belay zaroxanekeda têperîm dîtîm Lukas lepenay komelê mindal ke xerîkî yarîkirdin bûn zor besozewe degirya, piyawêkî genc ke lewê karmend bû le penayekewe dûr le Lukas rawesta bû. Bo bedbextî min giwême lê bû kabira bangî Lukasî dekird û deygut: “Bes bigirî, ger giryaneket nebîrîtewe kes yarît legel nakat!”. Her emem bîst zor xembar bûm û le şiwênî xom westam, ew kabiraye çî delêt? Dekirêt emende xemsard û bêperos bêt beranber be mindalêk le halî giryanda? Hestî hawsozî nîye? Ew deyewêt çî be Lukas bilêt? Le zaroxane giryan qedexeye? Ger to xemgînî îre şiwênî xemxorî nîye? Lêre تنها mindalî şad şiwênî heye?

⁴⁷ Nadawerî: not judicial, bêdawerîyîkirdin, dîdêk birîtî nebêt le naw û natore diyarîyîkirdin bo mirov.

⁴⁸ Kêşefirên: kêşexolqên, kêşesazkirdin.

Katêk geramewe be heman rêgeda xoşbextane dîtim ew piyawe gence le derewe rawestawe û cigere dekêşt. Leber ewe delêm xoşbextane çon twanay feramoşkirdinî em beserhatem nebû û her bîrim dekirdewe çon yarmetî Lukas bidem.

Her boye roştim bo lay em piyawe gence û pêmut pêm xoşe legelit bidûwêm ger larît nîye. Ew gutî zor asayîye, ferimû, beserhatekem çon bînî weham bo gêrayewe. Kabira wişk bû le şiwênî xoy wek çon diz be barewe degirît. Ew hestî kird hêrişim kirdûwete serî û becêgey giwêradêrîy kewte parêzgarî le xoy û witi: “To lem rojaneda legelî nebûy, ew berdewam degirî, min betewawî bêzar bûme lem giryaney”. Lêm pirsî: “To bîrit lêkirdotewe boçî degirît yan hokarekey dezanît?”, kabira çawêkî lêkirdim û welamî nedawe. Gutim: Pêmwaye em giryaney Lukas hokarêkî heye. Wa bîrkewe to xemêkit heye û lepir le jûrî pişûdanî stafî kareket dilteng debêt û dest begiryan dekeyt, hest beçî dekeyt ger yekêk le hawkarekanit pêt bilêt: Ger to îste em giryanet newestênît kes nayewêt lem şiwêne karit legel bikat. Pêt xoş bû ger hawkareket becê ewe bilê: “Debînim azarêkit heye, detwanim yarmetît bidem? Yan pirsiyarî diltengyeket lêbikat?”, kabira pêy gutim to xoşt nazanî basî çî dekeyt, pêm gut min rêzim heye bo boçûneket, belam ger to pêt başe min detwanim bêm û beşdar bim le civîn yan her ragorîneweyekî dîke bo gftugokirdinî em core babetane, lewaneye bem şêwe hemûman şit le yekdî fêrbîn, belam ew neywîst.

Le derfetêkda hemû beserhatekem bo dayikî Lukas gêrayewe, ew zor supasî kirdim ke peroşî Lukas bûme. Min layengîrî here behêzî kiraweyî nêwan bawan û stafî zaroxanem derbarey her şitêk hestî mindal burûjênêt. Katêk serpereşt dezanêt mindal hest beçî dekat, bo nimûne dijwarbûnî hevbendî nêwan bawik û dayik yan dostî nêzikî le zaroxane yarî legel nakat - ewdem kesanî berpîrs le mindal şîmaney gewretiryan heye bo têgeyiştin le doxî mindal û bedemewe hatinî.

Dûwatir zanîm bawikî Lukas dû hefte dûway beserhatekey min xoy koştûwe. Mindal zor hestiyarin û zû dezanin be dijwarî doxî bawaniyan, dûway em rûdawe têgeyiştin le hoy giryanek bekey Lukas asane ke dû - sê hefte pêş xokuştinî bawikî rûy deda. Lukas hestî kirdibû ke doxî derûnî bawikî nahemware, boye hemû rojêk em xemey debirde zaroxane, belam bedaxewe kes lewê lê tênegeyişt û bexemsardîyewe reftaryan legel kird. Îsta depirsim: Kê pêwîstî be fêrbûnî twanay civakîye? Kabiray stafî zaroxane yan Lukas? Hest be pejareyekî zor dekem katêk em mêjûwe denûsim. Dezanim Lukas yekem mindal nîye bem şêwaze reftarî legel dekirêt, pêşimwaye kabiray stafî zaroxane bêguman be şêwazîkî dîke reftarî legel Lukas dekirêt, ger ew boxoy le mindalîda hawsozî ezimûn kirdiba. Mirovî hestirûşaw be asanî hestî kesanî dîke derûşênêt, be boçûnî min gewretirîn berokgîrîy lewedaye: Hêriş nekîrête ser kabiray stafî zaroxane yan stafî dîke yan bawanêk ke heman heley ew kabiraye deken, belam bijareyekiyen pêbdey hem xoyanî têda bibîninewe hem mindaleke. Min natwanim kesêkî dîke bigorim, tenha toy detwanît xot bigorît ger bitewêt. Ger bitewêt layenî miroyt geşe bikat, bibe be bawan yan mamostayetî zaroxane bike pişet. Zaroxane baştirîn gorepane bo tojînewe û geşepêdanî dilovanî hawaheng û firelayan.

Berokgîrîm bo to: Pêş her carêk legel mindal dedûwêyt bîrbikewe; Boçûnim çon debû ger bem şêweye reftar û qsem legel kiraba? Herkatêkîş hestit kird witey hele yan reftarî helet kirdûwe daway lêburdinî lê bike, em lêburdiney to zor giranbehaye bo mindal. Min pêmwanîye mindal fêrî gutey lêburdin bêt ger bawan yan serpereştyan pêyan nelên.

Zaroxane dekirêt baştirîn plan û progiramî fêrkarîy hebêt bo mindal, belam şêwazî reftarî stafe, biryar dedat ewan sêreyan gîr biken le fêrbûnî niwê yan her lebîrî giyan derbazkirdinda bin. Ewe girîng nîye îwe çî legel mindal encam deden, belam çonetî reftarkirdin legel takî mindalda giringtirîne. Em layene naw xêzanîş degirêtewe.

Be mindal bilê to çît lêyan dewêt, riste be wişey “Me” destpêmeke

- Bîrmekewe le sêwî sewz!
- Îste to bîr leçî dekeytewe? Bîr le sêwî sewz dekeytewe?
- To pêtwaye min pêt bilêm, min çîm pêbaşe neykeyt?
- To pêtwanîye jîranetir bêt, pêt bilêm çîm le to dewêt encamî bideyt?

Katêk to be mindalêk delêyt ke le ser mêzêk rawestawe: “Min dawat lêdekem biroyte ser zewyeye”, bem core be mindal delêyt to çît lê dewêt. Pêçewanekey debête: “Le ser mêzeke rameweste”, em peyame tenha be mindal delêt to çît le mindal nawêt, belam hîç şitêk derbarey wîstî to nageyenêt. Lêreda mindal pêwîste daxwazî to bidozêtewe - ger to boxot bizanî daxwazyeket çîye?

Nimûneyekî zor rûntir, dekirêt mindalêk bêt dengedengî zor bikat, zor bawe bilêyt “Dengedeng meke!” Min belênit pêdedem pêşniyazêkî pêbikewî karîgerî pitire lewe, wek: “Pêt xoşe wêne bikêşî?” Yan, “Pêt xoşe wêne bikêşî yan be xiştokerî bikeyt?” Carêkiyan giwême le jinêkî jîr bû gutî: “Mindal daway sernc naken, ewan arezûy peywendyan heye”. Belê, ewan arezûy peywendyan heye legel ew bawane yan serpereştey legelîn, heta bawan katyan bo terxan bikat, giwêyan lê bigirêt û têbikoşêt biçête astî mindaleke.

Katêk to destewajey “Demewêt û namewêt” legel mindalda bekar dehênît peyvrûnî ke to kêyt û çît dewêt, berpîrsayetîy takî xot degirîte esto û peyamêkî konkirêt le wîstî xot arastey mindal dekey. Bem core derfet be mindal dedeyt bepêy wîstî to reftar biken. Ger to sereray peyvrûnît hestekanî xot û mindal bepêy dox û kat be wişey derbirît ewkat be şêwazêkî hawbeha û bêberawerd legel mindal reftar dekeyt.

Tenha şitêk wişey “Debêt” y bo bekarbihênît mirdine, dena hemû şitêk le jiyanda bijareye.

Salanêkî zorî xayand heta twanay xodîdim peyda kird, yan twanîm hestzîrekî xom derxem. Hoyekey hebûnî bawanêk bû ke wişey “Debêt”î berdewam bekardehêna. Le temenî mindalîmda wek hemû mindalêk betewawî wabeste bûm bawanim bexêwm biken û xoşewîstîm bidenê. Boye sengerî naçarekîm helbijard bo bekarhênanî em “Debêt”ane, belê, min bûme ew kiçey pêdelên: “Giwêrayel, zîrek û diloan” ewey min fêrbûm bîrîy lêbikemewe: “Reçaw negirtinî xom bû, jêrpê xistinî xom, min rahatûm bibime qurbanî wîstî kesanî dîke”. “Hemû kes le min girîngtîre”. “Îste debêt çî bikem?” Dekira min bijarekey dîkeyan helbijêrim, wek pêştir basim kird. Demtwanî bijarey berengarîy helbijêrim, dijî hemû em “Debêt” ane bibimewe, dijayetî bikem û tundûtîjîy biniwênim. Belam emeyanim nekird.

Fêrbûm pitir giwê bo kesanî dîke bigirim, lebatî xom, her boye wîrdewirde xomim ledest da û namobûm le xom. Tenanet bo yekcarîşim lebirî niye serpereştekanim lêyanpîrsîbim: “To çît dewêt..? Ray to çîye?” Yan: “Doxî to çone îsta?”.

Eme way kird min bibime mirovêkî zor berûnferman. Watakey bûwe berdewam bîrkirdinewe û geran bedûway: “Çawerwanî çîm lêdekirêt? Debêt çî bikem bo rezamendî em mirovane? Serpereştekem lemin tûreye? Çîmkirdûwe wa ew le min tûreye? Îsta pêwîste min mîhrebîm bim heta serpereştekem minî xoş bûwêt”. Min fêrbûm berpîrsayetîy hestî ew mirovaney lexom gewretir bûn bigireme esto û katêk riskam berdewam bûm le beesto girtinî hestî kesanî dîke û peywendîm legel hestekanî xom nema.

Salanêkî zorim le jiyani xom bekarhêna bo pejrandinim le layen kesanî dîkewe. Emro pêmwaye hemû mirovêk bo jiyani xoy hatûwete em cîhane. To hatûyte em cîhane bo ewe jiyani xot bew corey detewêt beserîbibeyt, nek bo xizmetkarî kesanî dîke, û herweha mindalekanîşt beheman şêwe yan ew mindalaney to le zaroxane serpereştyan dekeyt. Ewan lêren bo beserbirdinî jiyani xoyan, belam bo ewey bitwanin bo xoyan bijîn pêwîstyan be peywendîye legel qîbilenimay xoyan- hestekaniyan.

Waz le bekarhênanî to, ême, piyaw / mirov le destpêkî riste bêne û be min destpêbîke

Zorbey mirove riskawekanî em rojgare ezimûnî em şêwaze peyveyan heye le bawaniyan, “Be esto negirtinî berpirsayetî le peyvda” To, ême, piyaw / mirov:

- To debêt çaketeket leberkeyt! (Kê eme delêt?)
- To debêt îste bêyte jûrewe (Kê eme delêt?)
- Piyaw/mirov natwanêt bem core birwate derewe (Kê eme delêt?)
- Piyaw/mirov debêt destî bişwat (Kê eme delêt?)
- Ême debêt waz le yarî bînî (Kê eme delêt?)
- Ême debêt îsta biroyn (Kê eme delêt?)

Ger kesanêk bem şêwaze legel to bidûwên, em şêwaze kêşefirêne! Pêt xoşe fermanekey cêbecê bikeyt? Min pêm xoş nîye...

Ey bijare çîye? Bijare eweye ke mirovî riskaw peyvrûn bêt, berpirsayetîy rêberane bigirête esto, beşêweyekî kêşebeder bidûwêt û lexoyewe destpêbîkat, min demewêt...

- Min demewêt to çaketeket leber bikeyt!
- Min demewêt to bêyte jûrewe!
- Min demewêt to çaketeket leber bikeyt pêş ewey biroyte derewe!
- Min demewêt to destekanit bişoyt!
- Min demewêt to waz le yarîkirdin bînêt!
- Min demewêt îsta ême biroyn!

Mindalî xawen twanay civakî bem şêweye dedûwêt, beşêweyekî kêşebeder her lexowe ristey be min destpêdekat: “Min demewêt û min namewêt...”. Katêk mindal degate temenî serbexoyî bem şêweye dedûwêt, ewî pêştir pêy degutira temenî lasarî (Dewrûberî 3 salan). Derbirînî toş lem temene her weha bûwe, hemû mindalêk lem temene bem şêwe dûwawe û dedûwêt. Ey hokarekey çîye hemû mirove riskawekan delên: To debêt... To nabêt... Piyaw / mirov debêt... Piyaw / mirov nabêt...? Bêguman ême le bawaniman fêrbûyn û sêregirîy xoman lebîr çûwe le katî axawtinda. Ême fêrbûyn nelêyn çîman dewêt, belam fêrbûyn çî debêt bikeyn, ême fêrbûyn le rêgey mêşkimanewe xoman derbirîn nek le rêgey dil û derûnewe.

Ger bawan bilêt: “Min demewêt”. Yan: “Min namewêt..”, xoy aşkira dekat û mindal têdegat ew kêye û çî dewêt. Bem şêweye bawan peyvrûne beranber be mindal û em rûnbûne zor girînge bo mindalî civakî emro, hoyekey bûnî rêber û serpereştî zore le jiyânî rojaneyda. Hêndêk mindal dû bapîre û dû dapîreyan heye, dûway eman karmendanî zaroxane, yarîge û xizm û kes lêre û lewê peywendî çîryan legelyan heye.

Be wişe hestekanî xot û hestekanî mindalîş derbire

Wajey xogirî- integrity watay tewawî yan bêkemukurî dedat, katêk to bem şêwaze legel mindal reftar dekeyt û ewan hest naken to bekemyan dezanît, ewdem to debîte piştîwan bo hestî xogirî mindal. Em piştîwanetye lerêgey em wajanewe destpêdekat: “Min demewêt..”, “Min namewêt..” û derbirînêk le xudî xotewe destpêbîkat û mindal têbigat to çît dewêt û çît nawêt. Bo ewe mindal hest nekat to bawan yan serpereştêkî zalît girînge layenêkî dîke bem wajane ziyad bikeyt, ewîş hestekanî xot û ewî le mindalda deybînît be wişe derbibirêt katêk hest dekeyt pêwîste.

Peyamî: “Min demewêt... Yan namewêt... Wa dête berhest ke zor req û dabire, belam em peyame bo mindal zor asantire xoy legelda biguncênêt, ger to hestî xot û hestî mindal be wişe derbirît”.

Nimûneyek: Kiçezakem ke temenî sê salane le nêw baniyoy hemamda yarî dekird, em kure demêk bû lewê le nêw awekeda bû û minîş demewîst lewê bîhênime derewe, çunke sbey debû birwate zaroxane. Min demwîst berpirsayetî û rêberayetî pêwîstî ew bigireme esto: Em mindale pêwîste biniwêt, emca eme rûda:

- Min: “Min demewêt to îste le baniyoyeke bêyte derewe”.
- Kureke: “Nexêr, min demewêt ziyatir mele bikem”.
- Min: “Demewêt paş kemêkî dîke bêyte derewe”.

Dûwatir:

- min: “îsta demewêt bêyte derewe”.
- Kureke: “îsta ne, kemêkî dîke”.
- Min: “Nexêr, her îsta”.
- Kureke: “Na, min demewêt mele bikem”.
- Min: “Kurim, dezanim to detewêt mele bikey”.
- Kur: “Na” û destî kird be giryan.
- Min: “to xembarî, têtdegem, dezanim pêt xoşe berdewam bît. Bot heye xembar bît”.
- Îdî min destim kird be helgirtinî le nêw baniyoyeke û ew degirya û xoy radeweşand.
- Kur: “To bedî”.
- Min: “Belê, dezanim to emet pê bede”.
- Kur: “Min demewêt mele bikem”.
- Min: “Belê, min dezanim”.

Paş ewey xemî melekirdinekey tewaw bû destiman kird be dûwan derbarey şitî dîke. Lewkatewe bem şêwaze legel mindal reftar dekem, be giryanî mindaleke ne dilim teng debêt ne wîjdanim azarî pêdegat. Hoyekeşî eweye, min ne perawêzim xistûwe ne şikandûmetewe.

Amancî min wek bawan selimandinî hemû hestêkî mindale û rêpêdanîyetî bew hestey heyetî. Min rêm be kiçezakem da xemî berdewambûn le melekirdinekey bixwat, تنها ewey dembînî be wişe derimdebirî û biryarimda wişey bed kar le kesayetîm nekat. Pêm negut, bese, waz bêne megirî yan to zor lasarî û...htd.

Hemû hestêk bo kesî xawen hest diruste, hîç hestêk hele nîye, ne hestî mindal ne hî gewre.

Goranî layenêkî dîke paş gorînî reftarim beranber be mindal, danenanî sinûre boyan, îsta تنها sinûrî kesekî xom diyarî dekem. Lêreda min dakewtî xom pêşanî mindal dedem nek layenî sinûrî rewîştî û paşanîş berpirsayetî bixeme estoy ew. Bo nimûne: “Bese, îdî wazbêne le melekirdin, kajêr ewendeye û to îsta debêt bixewît dena, sbey zor mandû debît û bexeber nayeyt”.

Ciyawazyekî zor heye le nêwan em dû şêwaze derbirîney sinûrdanan:

- Dananî sinûr bo mindal: “Nabêt to..”, dekirêt zor şikêner bêt û doxêkî şad têkdat, leber nebûnî guman lem peyamede. Wek ewe waye to be kesêk bilêyt, to debêt îsta binûyt çunke xuda way ferimûwe. Ger narezamend bît pena bo kê debeyt? Legel kê hawrayt?!
- Baskirdinî sinûrî xot bo mindal û derbirînî hestekanî xot be wişe û ew hestey lay mindal berçawt dekewêt: “Min tûrem, min namewêt..., têtdegem to pêt bede”, derikkirdinî zor

ciyawaze le şêwazî pêşû. Doxî şadî mindal û peywendî bineretî nêwan mindal û gewre têk naçêt. Mindal perawêz nakewêt, hokarekey pejrandinî hestekanîyetî lelayan bawanîyewe.

Pêwîste bo xot bizanît çît dewê heta bitwanî be mindal bilêt: “Min demewêt” û “Min namewêt”.

Carêkiyan staffî zaroxaneyek hate lam bo derûnsarêjî, em xanime min lêre nawim nawe Hilde, tûşî nexoşî xemokî bibû, doktor le kar helîpesardebû. Hilde deygêrawe lew zaroxaney karî lê dekat staffî zaroxane zor mkurin le bekarhênanî wajey: “Min demewêt û Min namewêt” Le axawtin legel mindalda, belam min pêmwaye em şêwaze zor qurse. Leber ewe min nazanim çîm dewêt û twanay gutinî “Min namewêt” yişim nîye! Dekirêt bilêm? - Beşermewe pirsiyarî kird! Hilde le xîzanêkda gewre bûwe hîç rêzêk nebûwe bo sinûr û pêwîstyekanî û det kes pirsiyarî lê nekirdûwe ew çî dewêt yan çî nawêt.

Hemû mêjûy Hilde basî jinêkî gence ke bo xoy nazanêt kêye, leber ewe rîşey pênasay le xomtimaneyewe serçawe degirêt (Ew karey deykat - pîşekeyetî). Em jine rîşey seqamgîrî nîye lexoyda (Hestîrekîyekî sûdbexşî nîye û kesayetî xoy nanasêt). Hilde fêrkirawe sêregîr bêt le pîşe û ew karey deykat, ger em kar û pişeyey baş bêt bo dewrûberî, mirovêkî berûnfermanîye û derûnfermanî nîye.

Em jine le bawanîyewe fêrî xodîd nekirawe, boye be gewreyiş pêwîstî sinûr û hestekanî namon bo xudî xoy. Ew kesaney Hildeyan xoşdewêt tûşî kêşe debin legelî, ewan nazanin Hilde çî pêxoşe û be çî şad debêt.

Kesanî dîke nazanin Hilde kêye ger Hilde twanay xodîdî nebêt, pêwîste basî sinûr û pêwîstîyekanî bikat heta kesanî dîke rêz le sinûrekanî bigirin û reçawî bigirin. Bo bedesthênanî em twanaye pêwîstî be rîjeyekî peywendye legel hestekanî xoyda.

Le katî sarêjkirdinî derûnî Hilde, hewilim pejrandinî hemû hestekanî bû, heta twanay xodîdî têda bibujêtewe. Amancî min le gêranewey em babetey Hilde, tîşk xistine ser em hemû mirove riskaweye ke lelayan bawaniyanewe ne reçawinegîrawin û ne hestyan pejrêndirawe. Zor girînge bo em mirovane xodîdî xoyan zîndû bikenewe lerêgey sarêjkirdinewe. Mirovêk kêşey hebêt le xo behend wergirtin, pêşmercî têda nîye bo twanay peyvruî le beranber kesanî dîke.

Ger ezimûnit heye lem beserhatey Hilde sebarex bexot? Detwanim pêt bilêm hêndêk pirsiyar arastey xot bikey: “Çîm dewêt? Îste halim çone? Îste hest beçiy dekem?” Detwanît çendîn car le rojêkda lexot bipirsît. Ger to namo bît beranber bexot, nazanît doxt çone yan welamit bo pirsiyarekan nîye. Nezanînî doxîş welame, ger to welameke biselimênît! Em core selimandine rêz lexo girtine ke to nazanît doxt çone û hîç kêşe nîye. To ewey ledestit dêt dekeyt û min pêmwaye zor başe!

Nakirêt legoşenîga, ast û doxî xotewe çaw le mindal bikeyt, be boçûnî min zor girînge toy bawan yan serpereşt bûwêrît bem berokgîrye - ewîş xonasînte.

Mindal pêwîste bizanêt to kêyt heta letektda hest beasûdeyî bikat.

Bawan pêwîste zimanî derbirînî legel zimanî cestey yekangîr bêt, heta mindal hest be asudeyî bikat. Bawanêk rastgoye derbarey hestekanî û şitêk nalêt ger mebestî nebêt. Bawanêk xoy behend werdegirêt, bo nimûne: “Min nazanim çîm dewêt. To çît dewêt?”.

Piyawêk be nawî Magne katî lam girt bo derûnsarêjî. Em kabiraye hestî dekird zor le kêşey nêwan dû mirov detirsêt û deywîst çareyekî bo bidozêtewe. Ew deygut lebîrye le temenî mindalî katêk dayikî tûre debû lêy be hîç şêweyek neydedûwan, em nedûwandineş zorcar çendîn rojî dexayand. Katêk beserhatekey degêrayewe azar le wîrg û sîngî peyda debû û neydetwanî beteway henase helimjêt. Lemawey gêranewey beserhatekey min têgeyîştim le hokarî tirsî le kêşey nêwan xoy û kesêkî dîke. Magne ezimûnî way rahênabû, ciyawazî bîrûra, hokarî hestî perawêzxistinîyetî. dayikî Magne bebêdengî peyamêkî arastey ew dekird: Katêk to reftarit wehabêt, min tom xoşnawêt, belam ger to reftarit bedilî min bêt ew kat tom xoşdewêt û detdûwênim.

Dayikî Magne xoşewîstî mercdarî deda be kurekey, katêk kurekey bepê wîstî ew reftarî dekird, xoşewîstî dedatê, ger na lê werdegirêtewe, wek: Perawêzî dexat katêk reftarî mindalekey bedil nebû. Encamî xoşewîstî mercdar eweye mindal hest dekat kes xoşî nawêt û dekewête derewey baziney xêzan. Bem core fêr debêt bo bedesthênanî xoşewîstî pêwîste be giwêy kesanî dîke bikat. Hîç seyr nebû ke Magne tirsî le kêşe hebêt.

Bîrkewe ger dayikî Magne gutbay: Min tûre debim katêk to peyman deşkênît, min her îste demewêt peymanekeman becê bihênît. “Ger dayikî rastgo baye derbarey hestekanî xoy (Min tûre debim..) Û be kurekey gutba çî lêydewêt (Min demewêt...), ewkat derfetî deda be kurekey bînasêt û bizanêt çî lêdewêt. Bem şêweye Magne têdegeyişt sereray hêndêk lasarîkirdinî û peyman şikandinî hestî dekird dayikî her xoşîdewêt.

Salanêkî zorî jiyanim bekarhêna bo bedesthênanî zîrekî le perawêzxistinî bertekî mindal nek xudî mindaleke. Her boye zor şanz debim katêk hest dekem twanakem cêgîr bûwe. Carêkiyan kiçeza temen 5 salanekem çend rojêk lam mayewe û hêndêk şit rûyda: Be dirêjayî rojî şemme û yekişemme em mindale pencey le lûtîda bû û çilimî derdehêna û yarî pêdekird. Min pêmwaye ziyaderewî nebû pêy bilêm: “Pîse”.

Şewî yekişemme katêk ew çûwe nêw baniyoyekewe paş kemêk be ramanewe seyri kirdim û witî: “Mîzim kirde naw aweke”. Kardanewey yekserem çirçkirdinewey tewêlim bû, pêmgut: “Pîse, pêmwaye ew kirdeweye pîse, min pêm xoş nîye katêk to pence dekeyt be lûtîda û mîz dekeyte naw baniyoyeke. Demewêt her îste le banoyeke bêyte derewe”. Destim girt û le baniyoyeke hêname derewe.

Katêk le ser erzî hemameke westa bû çûwe penay dergeke û nîgayekî tûrey araste kirdim û gutî: “To delêt min pîsim!” (Be şêweyekî biçir biçir witî: To minit xoşdewêt?) Welamim dayewe: “Min tom xoşdewêt, belam pêmwaye katêk to mîz dekeyte nêw baniyoyeke û pence dekeyt be lûtîda kirdarêkî pîs dekeyt”. Be tûreyîyewe dergekey pêweda û çûwe derê. Min awî banoyekem gorî û serleniwê pîrim kirdewe le awî gerim. Paşan hatewe nêw hemameke, pêmgut: Detwanît be destit aweke taqîbikeyewe bizanî germakey başe, doste biçkolekem? Dawakemî cêbecê kird û witî aweke zor başe, dûwayî çûwe naw baniyoyeke û dirêjemanda be axawtin derbarey hêndêk babetî dîke, bêcige le basî ewey ke rûyda.

Rojî dûwayî çendîn car witî: “Oy wa dîsan pencem çû be lûtîmda! Min namewêt pencem biçêt be lûtîmda. Îsta îdî be zîp lûtîm dadexem ba pencem neçêt be lûtîmda”. Pêmgut bot heye lebîrit biçêt betaybet ger to rahatbêyt bem kirdare katî dewêt heta terikî bikeyt. Hawkat pêmgut min zor şadim madam to têdekoşît îdî pence nekeyt be lûtîmda.

Mercî axawtinêkî baş legel mindal pêwîstî be gewreyekî giwêgire koşes bikat têbigat.

Kitêbêk benawî “Lebîrit bêt bijî”, basî mêtûyekî kurt dekat be nawî “Çawim lêbike!” lelayen nûserêkî nenasewe. Pêmwaye zor kes xoyan lem beserhateda debînewe:

“Rojî yekişeme bû, hemû xêzaneke çûne derê bo xwardinî şêw, hemû kes lîstey xwardinî pêgeyişt bexeyrî Aniney temen 8 salan. Ew be bêdengî danîştû û be nîgayekî betalewe çawî birîbûwe jûreke, gftugoy dewrî mêzeke birîtî bû le babetî gewrekan.

Rojêkî taybet bû, dayegewre mîwaniman bû, maweyekî zor bû Anine ewî nedîbû. Emca xizmetçî⁴⁹ hat bo beradanî xwardinekan.

- Ey to çî dexoyt? Xizmetçî pirsiyarî le Anine kird.
- Anine welamî dayewe, sosêc,⁵⁰ petatey sûrkirow û kola.
- Lepir dayegewre hate qse witî, her nabêt - to debêt goştî mirîşk, sewze û petate bixoyt.
- Bawikîştî emey pê ziyad kird, şîrî bo bêne becê kola.

⁴⁹ Xizmetçî: pêşxizmetçî le xwardinge, weytir waiter.

⁵⁰ Sosêc: *sausage*, goştî hardiraw le bergêkî nasikda le bastirme deçêt.

- Xizmetçîyeke wek hîçî nebîstbêt le Aniney pirsî, aw tematet dewêt bo petateke?
- Anine be belê welamî dayewe, xizmetçî bexêrayî gerayewe bo çêştxaneke pêş ewey bawanî skala derbirin. Emca Anine be zerdexenewe awrî dayewe le bawanî û gutî:
- Dezanin çî? Ew hestî kird min lêre danîştûm!

(çapî 1991)

Katêk em beserhatey Aninem xwêndewe, zor lam aşina bû. Boxom be mindalî berdewam bem şêwe reftarim legel kirawe, hawkat le şerman xom naşarmewe leber ewe boxoşim herwa legel mindalekanim reftarim kirdûwe. Min ke bîrî lêdekemewe bepêy ew zanistey derbarey xwardin ew xoşewîstîyey hambû bo mindalekanim berpirsayeyanim heldegirt! Îsta ke bîrî lêdekemewe debînim min biryarim dabû berpirsayetî nedeme mindalekanim lew şiwêney siruştî bû biyandemê. Min biryarim dabû mindalekanim behend wernegirim.

Mêjûy Anine rengdanewey riwangeyeke derbarey mindal ke be dirêjayî mêjû baw bûwe. Reftarî gewre legel mindal hemîşe serçawey le wîstî xoyewe bûwe. Nimûne: “To debêt goştî mirîşk be patate û sewzewe bixoy!” Watay nawerokî em peyame debête: “Min baştir dezanim to çî xwardinêkit pêxoşe, katêk to giwêrayelî minî, min hest dekem bawanêkî serkewtûm. To zîrekî katêk em heste bemin dedeyt”.

Ger becorêkî dîke amajey pêbdeyn debînîn ne tîşk xirawete ser wîstî mindal, ne çonetî doxî derûnî û ne çî ezimûnêk/ hestêk werdegirêt. Boye mindal hemîşe hestî be şikan kirdûwe, yan wek Anine perawêz xirawe.

Bêguman le civakî torbendda asûdeyî derûnî û xomtimane xesletêkî giranbehaye bo mirov. Emcore xeslete binewanî pênasay take ke sazênerî hoşiyarî û zanîne derbarey layenî behêz û lawazî xudî tak, yan hoşiyarî û zaniyarêk derbarey xom ke min kê. Hestêkî baş û sûdbexş yan hestzîrekî dedat. Gewrebûnî mindal legel bawanêk ke meylî têgeyîştin, kunçikawî, nasîn û axawtinin legelî nek tenha peyamî araste biken, yarmetî mindal dedat legel kesayetî xoy aşina bêt.

Boçî?

Katêk legel mindal dedûwêyt, têbikoşe wajey pirsiyarîy boçî bekar nehênît, meger le gftugoyekî feylesûfaneda wek: To pêtwaye boçî balindekan detwanin bîrin? (Ewkat pirsiyar rûy le mindal nîye).

Mindal wajey boçî wek hereşe debînêt:

- Hereşe lêkirdin: “Boçî weha delêyt?”
- Hêrişkirdine ser: “Boçî hawar dekeyt?”
- Tometbarkirdin: “Boçî ew erikey pêmgutî cêbecê nakeyt?”

Legel emeşda mindal le temenî zaroxane pêşmercî geşey têda nîye bo welamdanewey pirsiyarêk be boçî destpêdekat. Pirsiyarî lem core pêşmercî bîrkirdinewe û lojîkî pêwîste, em layeneş le temenî 6 salî bo serewe destpêdekat.

Katêk mindalêk le zaroxane pirsiyarî lêdekirêt: “To boçî le Rêbuwarit da?” Ew geşeyey nekirdûwe welam bidatewe (Herçend hokarekey emeye: “To nazanît, ba bot baskem. Min le rêbuwarim da leber ewe dayikim maweyek xembare û minîş pêwîst bû tozêk le bêzarî xom betal kemewe!”).

Ger amanct pêkhênanî gftugoyekî sazende ye legel mindal, pêşniyazt pêdekem hestekanî xot û ew hestey le mindalda deybînît be wişe derîbibire, emca pirsiyarî çî û çon bekar bêne yan hêndêk lew wişaney mindaleke xoy bekarî hênawe bîxe nêw ristewe. Katêk to bem şêwaze legelî dedûwêyt,

mindal betewawî hest dekat wîstî têgeyîştinî le peyamî mindaleke heye. Têkoşanî to bo têgeyîştin le mindal weha dekat ew hest bikat to reçawî degirî.

Nimûne, kurêk hest dekat bawikî têngat lew peyamey ew arastey dekat:

Kurêkî şeş salan ke bawanî hawjîn nîn: “Hergîz welamî telefonî min nadeytewe, min em kare zor be bed dezanîm”.

Bawik: “To pêştirîş emet bas kirdûwe, min welamî dedemewe ger derfetim hebêt”.

Kureke têdekoşêt basî hest û pêwîstyeke bawikî be bertekî parêzgarî lexokirdin rûberûy debêtewe.

Çî debû ger bawikî gutbay:

- Bawik: “min hergîz welam nademewe?”
- Kureke: “nexêr, pêmwaye karêkî bede”.
- Bawik: “Têdegem to be karêkî bedî dezanît. Min zor şad debim ke to wa delêyt, bem core to têmdageyenît ke pêt xoşe zû zû qsem legel bikeyt, minîş pêm xoşe. Pêt çone min hemû şewêk telefonit bo bikem? Pêt başe?”.

Waz le helsengandin bihêne, fîdbak⁵¹ -î kesekî bidewe

“Ay, to zor zîrekî!”. Hestdekeyt, eme watay çîye? Reçawt degirim katêk delêm to zîrekî?

Zîrek çîye? Bîrî lê bikewe...

Lebatî “Min delêm”: Em wêneye to kêşawte zor ciwane! Katêk çawî lêdekem şad debim, renekanîm pê ciwane!

Îste hest dekeyt be ciyawazîy em dû şewaze derbirîne? Yekem şewaz nimûneyeke le helsengandin, dûhemyan fîdbakî kesekîye. Lewaneye to pêştir bîrî lê nekirdibêtewe, belam ciyawazyekî zoryan heye.

Helsengandin becêgey welam, pirsîyarî zor lay mindal becêdehêlêt.

Nimûneye helsengandin: “To zor zîrekî”: Kê pêwaye min zîrekî? Bawikî yan hemû cîhan? Zîrek watay çîye? Hoy çîye to pêtwaye min zîrekî? Girînge mirov zîrek bêt? To detewêt min bibim beme? Zîrek?

Pêçewaneye helsengandin fîdbakî kesekîye.

Fîdbakî kesekî wata hemû welamêk ke bas le takî to û ewey pêt xoşe, dekat. Her boye fîdbakî kesekî wabestey axawtinî kesekîye, wek min pêmwaye, rastgoyî û tenha ewey to mebestite derbarey babeteke derîdebîrî.

Leyadime katêk min qaremanî helsengandin bûm û wajem bedewrî xomda heldeda wek: Zîrek û zorbaşe - zorcar kardanewey mindalekan debûwe: “To hemû carêk wa delêyt” Yan: “Min em core wesfem pêbaş nîye”, bepê ezimûn bom derkewtûwe her fîdbakî kesekî xom derdebîrim kardanewey mindalekan zor gerimtir û dewlemendîre û zorcarîş gftugoyekî sazende lê berhem dêt. Min rastgom legelyan û destewajeyekîyan pênalêm şadîhên nebêt boyan. Mindaleke reçaw degirim, tîşk dexeme ser karekey, rêzî lêdegirim û ewîş tekdanewey xom dedatewe: Behendim werdegirêt, giwê le gutekanim degirêt û berêzewe reftarim legel dekat.

⁵¹ Fîdbak: derbirînî ray kesekî paş kirdarî kesî beranber yan be nûsirawe yan be zarekî.

Mirovî peyvîrûn pabende be rêsay giştî û sinûrî kesekî

Dananî komelê rêsa siruştîye hem le zaroxane hem le nêw xêzan. Rêsay giştî ew normaneye bawan destinişanî dekat bo gewre û mindal yan her bo mindal. Em rêsa giştîyane dekirêt ciyawaz bêt le nêwan zaroxane û le nêwan xêzan.

Sereray em rêsa giştîyane pêwîste bawan yan serpereşt peyvîrûn bêt derbarey sinûrî kesekî xoy.

Rêsa giştîyekan:

Min pêşniyaz dekem pitir le 3-4 rêsay giştî nebêt. Katêk jimarey rêsakan kem û rûn bin, mindal asantir pabend debêt pêyan. Hawkat dariştinî rêsakan corêk bêt nawerokî peyam û wîstî to aşkira bikat, nek basî şitêk bikat to netewêt mindal encamî bidat. Leber nebûnî twanay xwêndinewey mindal le zaroxane baştir waye wêne û rengî corawcor bekar bènît bo wesfî nawerokî rêsakan û dekirêt be pîtî gewre û rengînîş bête nûsîn. Ewkat mindal twanay yarîkirdin be xwêndinewe fêr debêt, mindaleke twanay xwêndinewey nîye, belam leyadî naçêt ew wêne rengînane basî çî dekat. Her boye erikeke asan debêt û mindalekan wirdewirde têdekoşin rêsa nûsirawekanîş bixwênewe.

Nimûney dû rêsay giştî le zaroxane:

- 1) Wêneyekî peyamder bikêşe ke pêşanderî destêkî kirawe bêt û lêy nûsirabêt sûr bûweste yan le nêw wêneke yan le jêrîda. Em rêsaye pêşanderî katêke mindal delêt sûr bûwestêt, girînge hemû kes rêz lem rêsaye bigirêt. Bo nimûne le yarî dû grûp beranber yek û pêşbirkê dû layen û lem babete.
- 2) Wêneyey gilopî perînewey tirafîkêk bikêşe pêşanderî piyawêkî sewz bêt û le jêrewey binûse biro. Wêneke le hemû jûrekan bepê balay mindalekan helwase, em rêsaye be mindal delêt lesereho biro û ra meke.

Zor mindal hen le dû xêzanda dejîn û pabend debin bepê dû rêsay giştî ciyawaz. Her boye sûdbexş debêt bo mindal ger rêsa giştîyekan be şêwazêkî rûn û aşkira le nêw xêzanîş pêşan bidirêt. Berokgirîy min bo to eweye xot behend bigirît û tenha bew şêwaze rêsakan pêşan bideyt xot birwat pêye karîgerîy debêt, nek leber ewe min pêşniyazî dekem.

Nimûney dû rêsay giştî nêw xêzan:

- 1) Wêney mindal û gewreyek bikêşe destî yekdîyan girtûwe be rêgeyekda têdeperin şiwênî hatûçoy otombêle, lejêr wêneke binûse destî yekdî bigirin. Em rêsaye pêşanderî eweye mindal tenha detwanêt legel gewreyek ke destî girtûwe le şeqam biperêtewe.
- 2) Wêney çaketêk bikêşe helwasirabêt be cil helwasêkewe û cûtêk pêlawîş le jêrewey danira bêt. Le jêr wêneke binûse çaketeke helwase û pêlawekan le jêrewey dabinê. Em rêsaye be mindal delêt katêk çaketeke dakend helwase û pêlawekan bixe şiwênî xoy.

Sinûrî kesekî

Em cîhaney mindalî lê dejî pire le mirovî corawcor û ciyawaz û bepê kat têyda yekangîr debêt. Boye mindal sûdimend debêt ger legel serpereştêkî peyvîrûn bêt derbarey kesayetî xoy. Katêk basî sinûrî

kesekî dekeyt, be mindal delêyt to kêyt û êmey gewre hemûman sinûrî corawcor û ciyawaziman heye.

Mindal hest be asayîş dekat katêk legel serpereştêke peyvrûne derbarey sinûrî kesekî xoy, hoyekey degerêtewe bo ew serpereşte berpirsayetîy xoy be esto degirêt.

Mindal zeremend nabêt ger sinûrî kesekî to bibîstêt. Mindal zeremend nabêt bewey pêy delêt, belam çonî derdebirît yan çî core sîgnalêkî pêdedey katêk basî sinûrî kesekî xotî bo dekeyt.

Sinûrî kesekî çîye û çon to detwanît basî bikeyt bêewey mindal hest be şikan bikat?

Sinûrî kesekî sinûrêke to her îsta hete, wate sinûrî kesekî to berdewam degorêt. Ewey to îste pêtbaşe pêwîst nakat sbeynêş baş bêt, yan pêçewanekey. Sinûrî kesekî to wabesteye be doxî rojane û çî kesêk legel to le peywendîdaye. Bo nimûne dekirêt rûbdar to derbarey heman pirsiyar be mindalêk bilêy belê, be mindalêkî dîkeş bilêy nexêr.

Sinûrêkî kesekî cêmtimane peyweste be rastgoyî xotewe beranber be xot katêk derbarey sinûreket dedûwêyt, wate to hest dekeyt çît dewêt, pêş ewey derbarey sinûreket bidûwêyt.

Zorcar rûdedat to şitêk pesend dekeyt, carî waş heye pesendî nakeyt û katêkîş dêt to nazanît rat çîye beranberî.

Ewey biryardere bo kesêk bêhewêt peyvrûn bêt derbarey sinûrekanî xoy, "Belê" bilêt bo ew şitey pêyxose û "Nexêr"îş bilêt bo şitêk pêxoş nîye û nazanimîş bo şitêk lêy dilniya nîye: To boxot çît dewêt? Bo kesêk ke nazanêt çî bilêt derbarey wîstî. Bîrmekewe çî bede çî başe. Bizane îste çît dewêt.

Gutinî wişey nexêr be mindal be wîjdanî asûdewe, diyarîyekî gewreye boy. Mindalêk bawanî be wîjdanî asûdewe nexêrî pêdelên, fêrî deken nexêr risteyekî tewawe û ewan detwanin be wîjdanî asûdewe bîlên. Bizane çende girînge bo mindal bitwanêt bilê "Nexêr" katêk bo nimûne degene temenî herzekarî û pêşniyazî sîgar, khul, madey hoşberyan pêdekirêt yan ger kesêk daway şitêk le herzekarêk bikat û ew pêxoş nebêt bîdat. Katêk delêt nexêr, belê bexot delêyt û eme giranbehaye bo mindal fêrî bibêt.

Bepê ezimûnî xom bawanî zor hen welamî nexêr be mindalekaniyan delên bêewey betewawî bizanin çîyan dewêt yan her bîrîşyan le welameke nekirdotewe. Katêk to betewawî bîrit le welamî nexêr kirdibêtewe hem bo mindalî xot û hem bo mindalanî zaroxane, ewkat ewan hest deken û dezanin em nexêre buwarî danûstanî têda nîye. Ger welamî nexêrit pitir le nazanim biçêt, belênit pêdedem mindaleke hemû layenêkî lêkdedatewe û têdegat welameke dekirêt bigordirêt. Mindal zorcar wek kitêbêkî kirawe gewre dexwênêtewe.

Katêk dilniya nît le welameket, baştire welam nedeytewe, hoy ewey mindal kolinaden le pirsiyarkirdin dezanin mebestit nebûwe welamî nexêryan pêbdeytewe! Mindal wîstî hawkarîyan heye, boye rastgo be derbarey mebestit. Serrast û bûwêr be derbarey xot. Katêk derbarey sinûrî kesekîy xot bo mindal dedûwêyt, detwanît bilêyt: belê, nexêr, min demewêt, min namewêt yan min nazanim çîm dewêt. Katêk be wişe xot derdebirît û peyvî kêşebeder bekardehênît, mindal hest be şikan naken.

Ger to bepêçewane peyvt kêşefirên bêt û sêregîr bêt le mindaleke katî axawtin bilêy: "To nabêt..". Kewate to hiç derbarey xot û wîstit bas nakeyt û mindalekeş hest dekat perawêz dekewêt.

Ewca şitêkî seyr nîye mindal bertekî xembarî le xo biniwênêt katêk bedilyan nekeyt, wek grûgirtin û giryan. Berokgîrîy to debête xo tawanbar nekirdinit yan wîjdanî mindaleke birîndar nekeyt leber bertekî giryan, yan tûreyî ew beranber be sinûrî kesekî.

Rastgoyî û xoşewîstî dû dîwî yek babetin

Rêjey rastgoyî karîgerîy heye leser rêjey xoşewîstî le nêwan dû kesda û rêjey xoşewîstî wabesteye be rêjey rastgoyîyewe. Katêk to rastgoyt derbarey bîr, pêwîstî, sinûr û hestekanit û be peyamî minewe deryandebirît aşkirayt bo kesanî dewrûberit. Peyvî weha nêzîkayetî û asayiş debexşêt, rastgoyî asantire legel kesêk rastgo bêt derbarey xoy, heta kesêk be wişe bîr û hestî xoy dernebirêt, belam dozînewey bixate estoy layenî beranber.

Rastgo be legel mindal, mindalîş rastgo debêt legelit.

Mindalî griftdar çî le nêw xêzan bêt yan zaroxane katî zorî pêwîste bûwêrêt mtimanet bedest bênêt û rastgo bêt beranberit. Belam ger to becêgey ravekirdin û dawerî, rabimênît bo dozînewey hokarî: Tûreyî, mandûyî yan bêzarîy ew, ewdem mindal hest dekat behend werdegîrêt û mtimanet pêdekat ke to çakey ewt dewêt. Mindalêk hest beçakey bawan û serpereşt dekat, dewêrêt rastgoyt bibînît, encamekey debête bedesthênanî mtimane û xoşewîstî mindal.

Pêçewaney: Xoşewîstî bê rastgoyî û rastgoyî bê xoşewîstî kemterxemeyîye.

Mindalî emro bawanî sbeynêye

Şêwaze reftarî to legel mindal biryardere le çonetî şêwaze reftarî ewan legel xoyan û kesanî dîke le katî riskanda. Mindal wêneyekî naxekî le kes û twanay xoyan bepê fîdbakî bawan û serpereştyan le derûniyan desazênin. Boye her şîtêk to derîbirî û encamî bidey legelyan hokarin bo sazandinî kesayetîyan.

Hokarî zêde berşikî û nasikîy mindal degerêtewe bo baweryan be hemû peyvî bawan û serpereşt. Her boye mindal têngat le galte û teniz û herçî bibîstin betewawî werîdegirin. Galte debête hoy serlêşêwan û dûdilî lay mindal û karîgerîy heye le ser binemay hestî asayîş.

Bawan û serpereşt xawen rastîye lay mindal, boye zor girînge agadarî peyv, sîgnal, reftar û kirdarî xot bît. To beşdarî le sazandinî derik û tîgeyîştinî mindal û hebûn û nebûnî hestî twana û xobeha layan. Bêguman têkelbûn le civakda be pêşbîr⁵² -î “Xobeha, xotwana û xomtimane” jiyân asantir dekat bo mindalêk ke deriskêt.

Ême nerîtimane bilêyn: “Destpêkî fêrge, seretay cddîbûne”. Le dîdî minewe: “Destpêkî fêrge, kotayî cddîbûne le zor layenewe”. Katêk temenî mindal geştiye 6 sal û çûwe fêrge, pêşbîryan derbarey çîyan pêdekirêt û nakirêt rengirêj bû. Be şêwazîkî dîke bilêyn: Ew kesey pêywaye pêdekirêt û ewey pêywaye pêynakirêt herdûyan rast derdeçin!

Beray min girîngtirîn erikî to ewe nîye “Çî” encam dedey legel mindalda, belkû “Çon”-î encam dedey, emca le nêw xêzan bêt yan le zaroxane.

Mindal mirovî hestekîn, boye zor berşikîyan

Mindal le temenî zaroxane wek gewre bîrakenewe, ewan zal nîn beser lojîk û hizirda û bûnewerî betewawî rehan. Xesletî bîrkirdinewe yan hemû şîtêk yan hîç şîtêk rengdanewey em riwangeye lay ewan: “Ger to xoşîmit newêt, nefiretit lême”. Şîtêk benaw nêwend bûnî nîye. Ger bawikim perawêzim bixat, hemû piyawêk perawêzim dextat. Ewan lem temeneda mirovî hestekîn û bêlojîkin, bertekîyan le lêkdanewey hizirewe serçawe nagirêt, belkû le lêkdanewey hesteweye, wek: “Min bem şêweye hest dekem, kewabû eme debêt wabêt. Min hest be tawanbarî dekem, kewabû min mirovêkî bedim”.

Yekem kardanewey hoy hestekîbûnî mindal beasanî xo tawanbarkirdine bo nebûnî hawahengî ya rûdanî rûdawêk. Bo nimûne carêkiyan jinêk le nawendêkî derûnsarêjîda boy bas kirdim ke katêk ew temenî çiwarsalan bû dayikî ew babî becêhêşt, ewdem lew temeneda betewawî dilniya bû ke em xoy hokarî neguncanî bawanî bûwe. Hemîşe dilovan nebû û îsteş bawikî lêy tûreye (Lêkdanewey hestekî). Bizane em şêwe hest û bîre çende azarî heye bo mindalêk lem temeneda!

Girînge bawan û serpereşt bo pêşgirtin le hestî xobetawanbarzanîn lay mindal le katî biryardan beseryanda be wişe hestî xoyan û ew hestey lay mindal deybînin derîbirin. Nimûne: Ger yekêk le karmendanî zaroxane waz le îşekey bînît, pêwîste em kese be mindalekan bilêt, ger wa hest bikat: “Min hemû îwem xoşdewêt, wazhênanim le kar legel îwe leber hoy giwastinewey şiwênî jiyanime bo cêgeyekî dûr lêre, her boye natwanim berdewam bim legeltan”. Ew peyamey lêre be mindal degat: “Min waz le karekem nahênim leber lasarîy to katêk le derewe yarîyman dekird”. (Yan her şîtêkî dîke mindal bîrî lê bikatewe.)

Katêk bawan biryar deden kotay be hawjînbûn bînin, zor zor girînge be mindal bilên: To hemîşe xoşewîstirîn kesî le jiyanimda, belam min û bawikit twanay hawjîniyman nemawe, boye... “Belam

⁵² Pêşbîr: bîrî sereta, destpêk.

tenha basî xot bike û rastgo be, girînge derbirînit leger hestitda hawaheng bê. Cêgeyetî lêre basî piyawêk bikem lem rojaneda hatbûwe lam bo amojgarî wergirtin, boy bas kirdim biryarîdawe hawjînî hawserekey û kure 3 salanekey nemênêt. Deqî pirsiyarekey eme bû: “Çon detwanim em gorankariye le jiyanimanda be bêzerertirîn şêwe bo kurekem cêbecê bikem?”.

Yekemîn basim layenî hestekîbûnî mindalî jêr temenî şeş salan bû ke twanay bîrkirdinewey lojîkiyan nîye û...htd. Encamekey debête beestogirtinî berpirsayetîy her rûdawêkî nexwaziraw ewan layenêk bin têyda. Bo nimûne dekirêt encamgîrîyan bem core bê, bawikim cêman dehêlêt leber ewe min dûwênî nemwîst gorewîyekanim lepê bikem, min mîhreban nebûm leger bawikim eweta becêman dehêlêt. Bo mirovî riskaw em core bîrkirdinewe hîç manayekî nîye, belam mindal beasanî xoyan betawanbar dezanin katêk ew mirovanekey xoşyan dewêt doxyan nesaz bê. Layenêkî dîkey katêke mindal hewalêk bibîstêt hestî bihejênêt, ewdem hemû sêrey le çend çirkeda win dekat. Boye bem bawikem rageyand, pêş hemû şitêk basî girîngtirîn diyardey bo bike, bo nimûne:

“Min tom xoşdewêt û hemîşeş agam lêt debêt. Min û dayikit maweyekî zore dekoşîn berdewam hawjîn bimênînewe, belam twanayman nemawe. Katêk ême netwanîn hawjîn bîn, min malim degiwazimewe, belam min her bawikî to demênimewe û heta hetaye û qetîş piştgîrît bernadem...”.

Hawkat pêmgut kurekey be bîstinî em hewale xembar, tûre û bêqerar debêt û lewaneyîşe çend hestêkî dijberî dîkeşî têda serhel bidat. Hîç rêgeyekî derbazbûnî nîye, dakewtî jiyân bêzerer nabêt bo kurekey û kardanewey hestekî debêt. Pêşmercî hevbenyekî teraz lenêwan mindal û gewre rêzgirtine le hest û derikkirdinî ciyawazî derbirînî hestî hemû mirovêk bepê kat û şiwên û selimandinî ke hîç hestêk hele nîye. Bezorî mindal be şewazêkî neguncaw hestî xoyan derdeberin. Berokgîrîy bo em bawike debête çonetî reftar katêk kurekey hestekanî be wişe derdeberît yan pêşan dedat, bo nimûne be bawikî bilêt to bedî û biro winbe le pêş çawim.

Zorbey bawan pêyan xoş nîye le layen mindalewe perawêz bixirên. Baştirîn yarmetî bo em kure le layen bawikîyewe be wişe destînîşankirdinî hestekan û selimandinîyetî, katêk bertekî kurekey lerêgey hestekanîyewe debînet, wek gutey: “Min derikit dekem em kirdarem azardere û to pêtinaxoşe”.

Bîrkirdinewey mindal lem temeneda xopesendaneye, em diyardey kesandin⁵³ ey le hemû şitêkda reng dedatewe. “Ger dayikim katî bo min nebêt, watay eweye min kêşem heye”. Bezorîş lêkdaneweyan derbarey pêranegeyîştin û destdirêjîkirdin her bem şeweye. Ewan berpirsayetîy rûdaweke degirine esto.

Xopesendekî beşêkî siruştîye le doxî dewranî mindalî û nîşaneyek nîye le rewîştlawazî. Mindal lem temeneda pênegeyîştûn diyardekan le riwangey mirovîyewe bibînin. Ewan pêyanwaye bîr û hestî hemû kesêk wek hî wane, katêkîş bîrkirdinewe û hestyan bem şeweye bê, nabine hawrêyekî baş bo gftugo. Boçî biçime qûlayî basêkewe kesî beranberim lèy dezanêt? Boye êmey gewre pitir rakêş debîn leger kesêkî hawtemenda gftugo saz bikeyn ger pêwîstiman be welam yan têgeyîştin bê. Nimûneyek: Rojêkiyan bawikî mindalêk hat bo birdinewey kure çiwar salanekey le zaroxane, katêk min û kurekey çûyn be pîryewe, bawikî pirsiyarî kird: “Kirîstof rojêkî xoşî hebû emro?”.

To hestit beçî dekird ger hawsereket hatbaye şiwênî kareket bo hênanewet û le hawkareketî pirsîba: “Filan... Rojêkî başî hebû emro?”.

Hevalêkim heye carêkiyan boy gêramewe: “Ger min leger hevale nêzîkekanî xomda derbarey em çemike agadarim kirdibanewe, axo îste çend hevalim hebû!”.

Leyadim nîye çîm be bawikî Kirîstof gut, pêmwaye şitêkî lem babetem gut: “Pêmwaye kirîstof rojêkî xoşî hebû, Kirîstof detewêt basî emrot bo bawikî bigêrîtewe?”.

⁵³ Kesandin: personify hênane serxo, bo nimûne babetêkî giştî bas dekirêt, takêk babeteke debestêt bexoyewe.

Mindal lem temeneda beasanî encamgîrîy hele deken, ger êmey bawan be rêzewe reftaryan legel nekeyn. (Dîsan: Lêkdanewey hestekî).

Legel eweşda çî be mindal delêyt pêwîste bizanît şiwênî gutinekeş girîngî xoy heye. Pêmwaye to legelim hawray ke baş nîye hawser yan hawkareket bişkênît le pêşçaw kesani dîke. Mindalîş rêk her heman hestî heye, boye ger to pêwst bû legel mindal basêk derbarey babetêkî hesthejîn bikeyt, baştir waye mindaleke bibête penayekewe û betenha legelî bidûwêyt.

Mindal dezanin çîyan pêxoşe, belam nazanin çîyan pêwîste

Êmey bawan û serpereşt berpîrsîn rêbdeyn mindal wek mindal bijî. Mindal legel bawanêk asûden berpîrsayetîy xoy bigirête esto bêwey lêkdanewey Leser bikat, belam lerêgey ramanewe pêwîstîyekani bibînêt.

Maweyek lemewpêş dayikêk ke sê mindalî heye peywendî pêwe girtim, temenî mindalekani sê, çîwar û heşt salan bûn. Em dayike werez bû bedest kiçe nawencîyekeyanewe, deygut: “Roj nîye pantolekey ter nekat, tenha be roj em kare dekat be şewan kêşey nîye”. Herweha kiçekey birdûwete lay duktur û hemû pişkinênêkî bo kirdûwe, belam hiç nîşaneyekî fizîkî nedîwetewe. Delêt xoy û mêrdekey naumêd bûne paş bekarhênanî çendîn şêwazî corawcor bo dinedanî kiçekeyan heta waz lem kirdarey bihênêt. Tenanet çendîn cor padaştyan taqîkirdûwetewe û bêzar û tûreş bûne, belam sereray em hemû tîşk xistine ser kêşeke hîçî lê kem nekirdûwe. Katêk em dayike peywendî legel girtim bêhîwayî pêwe diyar bû çunke hiç rêgeyek nemabû bo hêrişkirdine ser kêşeke taqî nekirdibêtewe.

Le basekeda bom derkewt dû mindale kemtemenekeyan le yek katda û le yek jûr denun û le yek baziney zaroxane û tenanet wek yekîş reftaryan legel dekirêt, wek dayikî gutenî: “Ewan wek dûwane wan, yek pêwîstyan heye”. Kewabû em kiçe nawencîye ne gewretirîne û ne biçuktirîn le nêw mindalî xêzanda, hemûşiman dezanîn em şiwêne berteske le rewî xuşk û birada û hemîşe be nîwey cût debînrêt.

Hemûman pêwîstiman be reçawgirtin, selimandine bewcorey ke heyn le layen ew kesaney xoşimandewêt û hest bikeyn behay taybetiman boyan heye. Nek wek beşêk le kesêkî dîke, belkû tenha bew corey ke heyn.

Ray xomim bo dayikî kiçeke weha derbirî, kiçeket hemû pêwîstîyekani le layen îwewe reçaw nagîrdirêt. Ew pêt delêt pêwîstî çîye, wek zorcar mindal be şêwey zor pêçîde peyamî xoyan degeyenin. Bawan becêgey raman lew peyamey mindaleke têdekoşêt le rêgey bertekîyewe derîbirêt, tîşk dexene ser ew şêwazey peyamekey pêderdebirêt. Ewan sêreyan gîre le nîşane, kêşeke nek hokarekey. Min boçûnim wehaye ke kiçe deyewêt bilêt: “Daye, min pêwîstîme be tenha çend carêk pêkewe bîn, heta to baştir le hizir, hest û xewinekanî min aşina bît. Herweha pêwîstim be pêkewebûnimane le toş, bawike. Girîng nîye ême çî dekeyn lem kateda, tenha demewêt em kate terxan biken bo pitir nasîni min. Min demewêt hest bikem îwe seriqalin be minewe û giranbeham botan.

Em bawane şêwaze konekey dîdî civakî heremyan beranber mindal bekar hênawe: ême dezanin çî bo mindal başe û niyazî çîye û çawerwanîşin ew legeliman hawra bêt. Yan: “Biçkolekem min dezanim to çît pêwîste”.

Dab û nerêt sinûrdar bûwe bo tîşk hawîştine ser çonetî doxî mindal û ezimûnî. Têgeyiştin lem reçawinegirtine bedirêjayî mêjû ke mindal hestî kirdûwe nadîde degîrdirêt, wek em kiçe çiwarsalane asane. Ne kes pîrsiyarî lê dekat doxî çone û ne kes seriçalî dozînewey niyazî piştgiwêxirawyetî.

Mindal wîrdewirde niyazî be estogirtinî berpîrsayetîy jiyani heye, em erike zor asantir debêt ger ewan ezimûnî xobehend wergirtiniyan hebêt. Wata bûwêrin mtimane be xoyan biken, leber ewe ewan fêrbûne giwêrayelî wîstî derûnî xoyan bin. Ger ew kiçe çiwarsalaney hemû rojêk pantolekey ter

dekird lelayen bawanîyewe berdîd bikewêt û becêgey serkone û padaşt bikoşin têbigen le peyamekey wa dekat em kiçe asayîşî derûnî û xomtimaney geşe bikat. Em bawanêkî pêwîst nîye sêrey gîrkirdibêt le kirdarî be şirovekarî û çareser dozînewe bo kirdareke, belkû bawanêkî dewêt sêre le xudî xoy gîr bikat. Yekêk lew şêwazane em bawane bo reçawgirtinî kiçekeyan detwanin bîken: “Le amêzî bigirin û pê bilên min nazanim hokarî xoterikirdinî to çîye, min her tom xoş dewêt katêkîş pantoleket ter dekeyt. Doxî to çone? Şitêk heye bo minî bas bikeyt?”.

Kewabû bawan be wişe û be kirdar têdekoşin xoşewîstî xoyan bo mindal derbirin û giwêgir bin bo ewey le dilîdaye, mtimaneyan hebê pêy ke ew baştir le çonetî doxî xoy agadare û çî pêwîste bo baştirkirdinî. Emeş peyweste be temen û twanay axawtinî mindal derbarey pirsîyarekan. Girîngtirîn layen bo kiçeke eweye hest bikat bawanî birwayan heye ke ew baştir hest û bîrî xoy denasêt - layenêkî zor girîng bo geşey hestzîrekî sûdbexş. Mindal lekatî reçawgirtinî lelayen beranberewe kesayetî geşe dekat û bawan binewanî yekemin. Kesayetî mindal rengdanewey tekdanewey toye! Pêşmercî geşekirdinî twanay behend wergirtinî xohest lay mindal hebûnî bawanêke hestî xoy û mindal behend werbigirêt.

Dûwagute

Salanêk pêş le xulêkda beşdar bûm berêweberî xuleke wêney mirovêkî firebaskî pêşandayn ke her baskêkî rûy le şiwênêk bû. Le ser wêneke nûsirabû: Hemû ew nexşaney ême deybînîn û lepenay her baskêk nawî nexşêk nûsirabû. Bo nimûne: Jinî maldar, pispor le erikekey, mindaldar, bawikî kiç, dayikî kur, hevalî nêzik û...htd. Peyamî em kitêbe rêk pêçewaney ew wêneye basim kird. Ger min bimewêt wêney mirovêk bikêşim wesfî boçûnim bikat, debête: çonetî reftarkirdin legel mindal be şêwazêkî hawbeha, belam bêberawerdkirdin, kewabû em mirove tenha dû baskî debêt û pitir ne.

Bo reftarkirdin legel mindal be şêwazêkî hawbeha û bêberawerd pêwîste to nexşî kes negêrît û her xot bît, berpirsayetîy pêwîstî, sinûr û hestekanit bigirîte esto û be mindalî rabigeyenît bêwey hestî birîndar bikeyt. Pêşanî bideyt to mirovêkî riskawît, nexşî kes nagêrît û şanogerî nakeyt, belam rastgoy legel xot, bîrûra û hestit.

Katêk mindal legel bawanêk bêt rolî kes negêrêt û twanay xobûnî⁵⁴ hebêt, ew twanay xobûn e kopî dekat û karame debêt le jiyanda û tenha boxoy dejî. Bizane jiyân çende asan debêt to bepêy wîstî xot bijît bêwey pêwîst bikat arezûy kesî dîke cêbecê bikeyt, rol bigêrît, şanogerî bê şanoname zor zehmet debêt! Tenha xudî takî xobûwe dezanêt xoy kêye û mindalîş pêwîste bizanêt legel çi takêkdaye.

Mindal zeremend nabêt be agadarbûn le wîst û xwastî bawanî. Ewey ewanî pê zeremend debêt, şêwazî derbirînî pêwîstî, sinûr û hestekane.

Pêşniyazî min bo her kesêk meylî heye be şêwazî hawbeha û bêberawerd reftar legel mindal bikat detwanêt yekêk le hokarekanî nêw em kitêbe bekar bènêt, bo nimûne (Lekatî qsekirdinda ristekanî be min destpêbikat û waz le bekarhênanî debêt bènêt). Katêk biryarit da baştir waye le seretawe sêregîrît tenha Leser yekêk lem hokarane bêt heta hest dekeyt le derûntda cêgîr bûwe. Şad be le pêşkewtinit, şadbûn lem serkewtine biçûkane şadbûne le ser xudî jiyân.

Bawan û serpereştêk çêj le jiyânî xoy bibînêt, nimûneyekî başin bo mindal û le hemû şitêkda bezyadeweyan heye boyan. Bo ewey bitwanîn xoşewîstî bideyn, pêwîste xoman xoş bûwêt û lejiyanda legel xoman baş bîn.

Ewey min lem kitêbeda nûsîwme şêwaz nîye, corêkî bûne le cîhanda, to wek mirovêkî riskaw biryar dedeyt legel xot û kesanî dîke rastgo û mîhrebana bît. Merc nîye to çî encam dedeyt, merc eweye reftar, kirdar û derbirînit zadey dil û derûnit bêt.

Her boye nûsînekem be serguzêsteyekî Astri Horn Eriksen kotayî dehênim debarey çonetî reftarî legel kiçekey, katêk deygut bawanim bew rêjey min arezûme xoşyan nawêm.

"Kiçe 9 salanekem pêy wehabû min û bawikî, kiçegewrekeman lew pitir xoş dewêt, belam bêguman rastyekey eme şitêkî dîke bû".

Min zorim bîr lê dekirdewe ke debêt çî bûbête hokarî em bêbawerîyey be ême, sereray ew hemû care ême be kirdar û be gutar pêman degut û pêşaniman deda zorman xoşdewêt. Her boye biryarimda rêgeyek bidozimewe ta lêy nêzik bibimewe. Çareser bû be doay şewane, nek bewcorey le ayînda heye, belam şêwazî rewtekey. Bîrim kirdewe debêt hokarêk hebêt bo cêgîrkirdinî dab û nerêt, wek do`akirdin qena`etî be beşî herezorî mirovekan hênawe derbarey hebûnî hêzêk gewretir le xoyan ke ewanî be hemû layenî ayetî û nayetîyewe xoşdewêt.

Emca şewêk bedilovanî û ciddiyewe pêmgut demewêt dest be şitêkî niwê bikeyn, bepê ezimûn demzanî hezî le resimyat û cdîbûne herdû destîm xistenaw destimewe beçirî çawim birye naw çawanî û gutim:

⁵⁴ Xobûn: nexş yan rolî kesî dîke negêran, tenha bepê hest û wîstî xo jiyankirdin.

Legelim bilê: “Min Evîn, dezanim dayikim û bawikim xoşyan dewê”.

Ew çawî lêkirdim û be dengî cêgîr dûpatî kirdewe: “Min Evîn, dezanim dayikim û bawikim xoşmyan dewêt”.

Min berdewam bûm: “Min Evîn, dezanim kiçêkî zor ciwanim”.

Ew çawî lêkirdim: “Min Evîn, dezanim kiçêkî zor ciwanim”.

Pêmut: “Min Evîn, dezanim xuşkegewrekem xoşî dewê”.

Evîn dûpatî kirdewe: “Min Evîn dezanim xuşkegewrem xoşî dewê”.

Pêmgut: “Min Evîn, bom heye her bîr û hestêk pê mî xoş bêt hambêt”.

Evîn dûpatî kirdewe: “Min Evîn, bom heye her bîr û hestêk pê mî xoş bû hambêt”.

Pêmut: “Min Evîn, demewêt be asûwedîy le şiwênekem binûm”.

Evîn dûpatî kirdewe: “Min Evîn, demewêt be asûdeyî le şiwênekem binûm”.

Bînîm Evîn em nerîtey zor pêxoş bû çûwe naxyewe. Supasguzarim!

Min berdewam em nerîte legelî encam dedem û hêndêk le gutekan degorim, belam her be şewazêkî mîhrebane, sade û dabir ewey bo mindalêk girînge biselimêndirêt derîdebirim.

«...»